


# مھفل

گوچارہ کا رہو شہنیری وہ رزانہ یہ  
g.mehfel@yahoo.com


1  
شماره:



مھفل

2010

Mehfel 1



# فه‌رمانا فریق پاشا



مهران شیخ حسنه  
رهشکانی / زینیبا

پیشگوتن:

فریق عمر و هبی پاشا ئەو سەرکردی دولەتا ئوسمانى يى کو هەتا نە ئیزدى  
ودك مرۆڤەك دين و هو، درندە، تالانکەر، كۈزەكى مروۋان، ویرانكەر ئوند و  
مالان، تىيىبى خويىنى، خويىن ۋەخودر، دوزمنى خودى و مروۋاتىي و ب ھەر  
وەسفەكا كريت ناسىنە و تىيە ناسىرن. ژ بەر فەرمان و ھەو و ئىرشن وى بو  
سەر دەفەرین ئیزديان وەك شىخان، دەفەرا قايدىيا ( لەغا قايدىيا ) دەفەرا بن  
گەندى، دەفەرا دنا، دەفەرا ھەويىریا، چىايى شنگال و كار و كريارىن كريت و  
خراب و نەمروۋانە كرينه و ھەرج تشتى ب دەستى وى هاتى بىرە ژ سوتىن و

كافلەرنا گوند و مala و كوشتنا زاروکا و پېر و كala و دەست درېزكەن لىسەر قىز و  
بوكان ھەتا خرابكەن و ھەرفاندىندا قوبىن خاسا. ھەتا نەا ژى لەمە كەسەك  
كارەكى خراب و نەباش بکەت ئیزدى دېئىن (ھە فريق پاشا) يان دئ بېئىنى  
(كورو ما تو فريقى). يان ل دەمە كەسەك كۆتەكىي ل كەسەكى هەزار و بى  
دەستەلات دەكتەت تە دىت گوتىنى (واى ى ئەڭچ بۇ فريق پاشا بابۇ) دىسان ل  
دەمە رودانەك روو دەدت و خەلکى گوندى زلام و ژن، كور و كچ، بور و گر بەرەو  
جەن رودانى د بەزن و دچن، تەدىت ھەندەك ژ نو پى حسيان و گوتىن (ئەڭچ  
فەرمانا فريق پاشا ژ وەرە هات). بەداخەوه ھەندەك خوه فرۆشان ئیزديان وەل  
سەرانسەرى ئیزىدەخانى نەكامى و دېمناتىيا دين و ئول و مللەتى خوه كرن وەل  
پېشىا فريق پاشا و لەشكەر ئىزىدەخانى نەكامى و دېمناتىيا دين و ئول و مللەتى خوه  
قورتالكى نىشا وان دان و قوبى خاسان خرابكەن و باشتىن گرۇف ژى ئەوه ھەتا  
نەا وەل دەمە ئىيىكى ئیزدى خرابىيەكى بکەت يان نەبى ھارىكار و پشتەقانى دين و  
مللەتى خوه بت دېئىن (ئەڭھە ئەوه يى ل پېشىا فريق پاشا كەتى) دىسان ھەتا  
نەا ل چىايى شنگال كەسەك پەيغەكى بېزت و گۆمان دېھىقا وى دا بىت ژ  
نەراتىي ئېئىنى (دەرەوين زېرەكى خوه ژ فريق پاشا بېت) راستىا ۋى پەيغى ژى  
ئەوه كو فريق پاشا ھەندەك كەسىن خوه فرۇش و دوزمنىي دين و مللەت و  
ئېئىدىاتىي ھەر ژ ئېزديان ب كىرى گرتىبون ھارىكارى و پشتەقانى وە رىبەرى ژېرە  
كەن. فەرمانا فريق عمر وەبى پاشا ئىيىك ژ (72) حەفتى و دوو فەرمانىي ب  
سەر ئېئىدىاندا ھاتىنە ھەر وەك ئېئىدى بخوە دېئىن و ئېئىدىن دېرۈكى ژى ۋى  
چەندى دەدن خوياكەن.

ھەلبەت ھەر فەرمانەكە ھاتى ژ يابەرى وى بى دلوۋانى و درندەتربو. ھەلبەت  
پەتىيا وان فەرمانا بو سەر ئېئىدىان ژ پېيغەمەت ھىلان و دەست بەردا ئېزديان ژ  
ئولا وان يازەلال، دەست بەردا ژ ئولا كوردەوارىي يا كەفن ياكى رەھ و رېشالىن  
وى دگەنە بەرى ھاتىن عيسا پېيغەمبەر 1، دىسان دەست بەردا ژ تىتال و

ئا ب ۋى ئاوايى ئەو مىرخاس بونە شەھيدىن دين و مللەت كو ئىرو ئەم سەرفرازىن ب رابردۇنى وان. دغان شەر و قەوشەنин گران و هەۋىن قىركنى دا رولى ژنا ئىزدى يى بەر چاڭ بو و رولەكى كارىگەر ھەبويه و نافىن وان ژى د ئەسمانى دىروكاكوردى دا وەكى يىن وان قارەمانان ب پىتىن زىرىن ھاتىنە نفىسىن و بەلكو مللى خوه دايە مللى وان مىرخاسان و ب ناڭ لىدان و تىلىا و داگرتنا باروتى بوجەك و تىقەنگى شهر و بەرخودان پى كردن و دېمىن ب وان گوشتن، ھەلبەت دىروك فى چەندى دەدھوخيا كرۇن ژىنن وەك ( گولا كچك و گولا مەزن 2. و زەريقا ئوسى و شىرىپا شىخ كالو 3. و گەلهكى دن ) ھەلبەت نافىن ۋان شىرە ژنا د سترانىدا ھاتىيە ل دەمى دېيىت ( گولا كچك سى دەنگا دېيىر گولا مەزن، لى ئى خوهىيگى فى سېتى تو كارى خوه بکە ئەمەن چىنە سەر بانى چىل مىرلان گىيانى من گورى دىيارى سوکى، خودى ئاقانەكما لا فريق پاشا تارى كوبارا سېتى خىفەت و چادى خوه دانىنە ميراتى گرى كىدوکى و هەتك ) ھەلبەت ئەف باپەت چەندىن نفىسيه ران دايە قەلەمى ل پەھىي ژىددەرىن دىروكى و بەلكەنامىن فەرمى بەلكو ئەف نفىسىن يان ژى بەرھەڤكىنە من يا جىاوازە ژ نفىسىنەن دن ژ بەر ھندەك سەرھاتى و دوو دەقىن سترانىن فلكلورى يا چىايى شىنگالى ل گەل دا مە ئانىنە خوارى دا كو بۇ بەردىن فى فەرمانى يىن دستانا چىايى شىنگالى دا د روپەلان دا بەھىتە تومار كرۇن و خەلکەكى دن يى بىانى زانىارىيەن وان پېتلى بېن ل سەر مىرخاسيا كوردىن ئىزدى دەھەۋىن قىركنى و كوشتارىن مەزن دا. مخابن ستران ھندەك كىيم و كاسى كەتنى يە و ئەز بىاومرم كەلەك مىرخاسىن دن يى فى شەرى ھاتىتە خوارى، ھەلبەت ئەف ( 117 ) سال ل سەر فى رودانى را بورىن و ئەف ستران نىش بونىش و سترانبىز بۇ سترانبىز ھەتا گەھاندە فى قۇناغى لەو نافىن ھندەك كەسان ھاتىيە ژ بىر كرۇن يان بەندەك سترانى ھاتىيە وندەكىن و بەندەك لى زىدە بۇويه. دسەر فى گىشتى را ژى ئاپارىن و سۈپاس بۇ وان كەسان يىن كو ئەف سامانە گەھاندىنە رۆزا ئىرو وەك ژىددەرەك دىروكى و

رەشتىن كورددەوارىيى يىن كەفن. لى ئىزدىيان ب ھەمى شىان و ھىزا خوه بەرەفانى ژ ديانەت ئۇلا خوهيا شىرىن كرىيە و باوەرەيەكا ھەرا مەزن و موكم ب خودى و ديانەتا خوه ھەبۈويه ئەگەر ھىزا دېمىن چەند يى مەزن و دۇزار بىت ئەو دى ھەر ب سەر كەفت و زىيانىن مەزن و كوشتنىن بى ژمارە دانە و تالانكىن و وېرانكىن تەۋ قەبۈل كرىيە و بىريارىن دېمىن قايل نەبويه و ب ساخىا خوه، خوه نەدایە دەستى دېمىن و سەرى خوه ھېپەرەنەچماندە و دېمىن رورەش كرىيە و وەسا كرىيە دېمىن كوشتنىن خوه ل قادا شەرى ھېتلانە و ب رەقا خودرا نە گەھشتىنە وە بى ئۆمىد و سەر شور كرىيە يىن ماين و نەھاتىن گوشتن و زەفيرىنە جەھىن ژى ھاتىن. ئىزدىيان ب وەقادارى و جوامىرى و مىر چاکى و عەگىدىي و مىرخاسىي يى ناھدارە و سەر شورى و بى قىمەتى قەبۈل نەكرىيە، ھەلبەت دىرۇك فى چەندى دەدھوخيا كەن ز بەر ھەتا نە ژى رودانىن فەرمانا فريق پاشا دىسينگى پېرەمىر و سترانبىزىن ئىزدىيان دا و ب تايىبەت ل چىايى شىنگالى د پاراستىنە دەمى ل دیوانا و قەھەھەن و جاخىن جوامىرا ئەو ستران دەھىنە گوتەن و دسترنى و نافىن وان قەھەھەن و سەركىدا ئەوان بوغ و بەرانا و مىرخاسيا وان دگەھەتە گوھى مروف ئىك سەر تەۋزىنۈك ب مروفدا دەھىت، ھەلبەت مروف پى سەر بلندە و شانازىي ب وان دېن، دېسان ھەر وەك مروف ل پېش فلمەكى نەخاسىمە ئەو بوغ و بەران، ئەو عەگىد و گەرناس و سوار چاڭ ناڭل ئىك و دوو دەدەن و گازى ئىك و دوو دەكەن ھەر وەك د سترانىدا ھاتى ( ئوسى مەزىن كەكى كەمەل ب سى دەنگا دېيىرە مەھەما ئەقدو بابى سالح سقۇكى مەتوبابى بەرچەس، گەلى باب و ببرا مىرلى جى بىن لەپ ھلىنەن ب ئىزنا سلطان ئىزى ئەقرو ئەمەن فى نەزامى بشكىنەن و هەتك ) ول بەرۈكى شەرى ئەنيشاك ل ئەردە كوتان و د گوتەن چەپەرى خوه بەرندەن و ئارمانچ ژى ھەمى ئەوبۇ يان كوشتن يان ھشتىن ب سەربەستى وەك ئىزدىيك.

پیراونین نو ژ بۇ ساناهیکرنا بىسلمان كرنا ئىزدیان و ئەڭچەندە ژى دېلگەناما ئوسمانىدا يا بەروار كرى د ( 8 ) ئىكانونا 1891 ز دا هاتىه .

وەكى دامەزراىدىندا هندەك ماموستايىان و رىبەران ژ بۇ خواندىن ئىزدېيىن ئاكنجىي ولايا موسىل ئەركانى دىنى بىسلمانا 4. دىسان ھېجەت ل ئىزدیان گىتن و چاڭ سورى ئى كىن و دگوتىنى دېيت ھون لەشكريا ئوسمانى بىكەن وەكى ھەمى مللەتى عيراقى و ل وى دەمى والىي موسىل ( عبدالقادر كمال پاشا ) بو گوتە حۆكمەتا ئوسمانى دېيت سەركىرەتكى لەشكەرى بىشىن موسىل و ھەمى دەستەھەلات ھەبن ژ بو بىسلمانكىن ئىزدیان و لەشكەرى بىكەن ئەبو، ( فرېق عمر وەھبى پاشا ) هاتە دەست نىشان كرن ب فى چەندى 5.

ب بىيارا حۆكمەتا ئوسمانى ل روڙا ( 5 ) تەمۇزا سالا 1892 ئى ز 6. فەرېق عمر وەھبى پاشا گەھشتە بازارى موسىل وەك ئاپى سىرەك چالاڭ بو پەيوەندىيەن موكم لگەل كەسىن مەزن ژ بەرپرسىيەن دەولەتى ھەبۇن مينا سەروك وەزىز (الصدر الاعظم ) و وەزىرى الحربيه ھەۋالىن ئىك و دوو بون ل كولىژا (الحربىيە) 7.

پاشى فەرېق عمر وەھبى پاشا گەھشتى موسىل و كارىن خوه يى پى ھاتى دوو ژ وان ب جە ئىنایىن خوه بەرھەفكىر ژ بۇ كارى سىئ ئەو بو ئارىشا ئىزدیان ئەو ئارىشا كۆھفالىن وي يى بەرى وي ھاتى ب سەر نەكتىن 8. كارى سىئ ئەو بو د پىش گوتىنى دا من بە حس ئى كر كۆ دەستى وي كورى وي عاسم بە گەھشتە ھەمى دەڤەرىن ئىزدیان ھەچىا پى چى بويى كر وەك خراب كرنا قوبىن خاسا و ۋەكىندا قوتاچانىن دىنى بىسلمانا و گوشتن و تالان كرنا و بىن و دىزىنا نىشان و تاوسىيەن ئىزدیان ژخىنە ئەل - رەحمان (خانىي تاوسا ) ل ئاٹاھىي مىرگەها ئىزدیان 9. و ھەر ھوسا كوشتنا سەروك ھۆز و شىيخ و پىر و رىبەرىن ئۆلى ئىك ژ وان سەرھاتيان كۆ ھەتا نەو ئىزدى دېيىن شىيخ كالو سەرئ خوه ل حەرفى دا، ئەو بو دەمى ئىشىن فرېق پاشا گەھشتە دەڤەرا دنا و بارەگايى خوه و خىفەت و چادرىن خوه ل سەرئ چىايىن زاوا ۋەگىتن و پاشى ئەپسىيەر كرى كا كى كەسى

دېيىنە وان مىرخاسىيەن شەھرى بەرخودانى ھونن شەھيدىن دىن و مللەت و دېرۈكى ب پېتىن زېرىن ناھىيەن وە دناف رۆپەلان دا و ل ئەسمانى مىزۈووپى دا ھەمبىز كىرىھەزار رەحمەتى خودى ل وەبن .



#### شەھى فرېق پاشا د ژىدەر و سەرھاتيان دا

فەرمانا فرېق پاشا يا ھوقانە وەكى ھەمى فەرمانىن دن ب رەشى دروپەلەن دېرۈكى دا هاتىيە تو ماكىن ژ بەر دۇزاريا ھوقاتىيا فرېق پاشا و ھەر سەرنەگرتىيە و خەونىن دۇمان يېن گەنلى ب جە نەھاتىيە و ب شەھەستەنە كا مەزن ۋەگەر يەنەن ژىدەرەي فەرمانى دگەل زيان و خسارەكە مەزن ژ تانك و توب و كوشى و برينداران ژ لەشكەر و نەھير عامى ھەلبەت ھەمى شەھەفت و دار و بەر و گەلىي بىرىنى و كور بمبارك و گەلىي كەرسى و دارا زېنگى و كورا بەكرا و چەمى رەش و چەمى زوقاى و گەلەك جەھىن دن شاھد و دىدەقانى فى چەندى نە، پاشى شەھەستەنە ( فەرمانا ) ئەيوب بە گەھشتە ئوسمانى رابو ب هندەك

خوه بەرھەڤ كرينه ژ بو هەر ئىرىيشهكا وى ھەلبەت ھنارتنا (عاسم بەگ) ئەو بو دا كو ئىزدىيىن شىڭالى خوه ژ ئاسى بۇونى بەدن پاش و ژ وان بىرسن بەل نەوهەكى خەونىن وان يىين گەنى بون . ھىزا عاسم بگ يا پىك ھاتىبو ژ 5 پىنج كەتىبىن لەشكەرى ژ ھىزا رىك و پىك و د ئىرىشا بەرى دا ( 100 ) سەد لەشكەرى وى ھاتىيە گوشتن 12. پشتى ژكەستنا عاسم بگ ل ( 18 ) چىريا دوو فەرىق عمر وەھبى پاشا ژ موسىل دەركەت و بەرۇ چىايى شىڭالى ب رىكتە دا كو بگەتە لەشكەرى خوه يى مایى ژ شهر و گوشتى ب سەر كەردايەتىيا كورى وى عاسم بەگ ، ھىزا فەرىق عمر وەھبى پاشا يا پىك ھاتىبو ( 10 ) دەھ فوجىن لەشكەرى و ( 2 ) دوو كەتىبىن فرسان ( الخiale ) و ( 2 ) دوو بەتكەرىيىن چىايى زىدە بارى نەفيئ عامى ژ هوزىن عەرمەبا 13. ب گەھشتىنە فەرىق پاشا لگەل وى ھىزا مەزن يا لەشكەرى سالوخ و خەبەر ل ناڭ ئىزدىيىن چىي بەلافبون و گەلەك پى تەنگاف بۇون و پىتىيا ئىزدىيىن چىي ل بکرا كومبۇن ب سەركەردايەتىيا سەۋوکى مەتو مەزنى ھۆزا مسقورا 14. و ڈېلى عەرز و عەيال ژمارا سەكمانى ئىزدىيان نەدگەھشته سى ھەزار كەسان 15، جەپىن و كومبۇنىن ئىزدىيان ل بکرا بو ژ بەر ئىمناھى و تەناھى جە و ژ بەر زاھىا شەفتان و جەن ئاسى ل دەورو بەرىن بەگران 16. ئەوى خەلکى بەرھەفيا خوه كر ژ بو بەرسىنگ گرتىن دەزمەن و شەكتىنە و نزانىن كا چارەنفىسىن وان دى ج بت . سەرولك ھۆز و عەگىد و مېرخاس و قەھرەمانىن ئىزدىيان ب سەركەردايەتىيا قارەمان سەۋوکى مەتو بىيار دان كو پىكىھ چەپىنەكى بکەن بىتىن ژ بۇ پلانەكى دانىن كا چاوا دەزمەن بىشكەپىن و بەرەۋانىي ژ خوه و ژ عەرز و عەيال و ژن و زاروكان و پىر كالان بکەن ژ دەستتى دەزمەن خلاس كەن و نەھىلەن دەستتى دەزمەن بگەھن وان و كا چاوا دەربىيىن گۈژەك لسەر بازو لەشكەرى فەرىق پاشا بەدن و دەزمەن سەرشور بکەن و بى ئومىد بکەن و بىشكەپىن ئەوبۇ جەن چوقاندا خوه دەست نىشان كرن ئەو ژى ل كەرسى لىبن دارا زېنگى .

ئىزدى خودان دەست ھەلاتە ل دەفەرە و كى سەركىشىا وان يا كارو بارىن ئايىنى دەكتە ھەلبەت سالو خەت گەھاندىن و دگوتى شىخ كالو ژ شىخىن ئىزدىيابە ل وى دەمى شىخ كالو ئاكنجىي گوندى دوولبى بو 10. ئىكسەر فەرىق پاشا شاندە پى شىخ كالو ئەفجا شىخ كالو لگەل برايى خوه شىخ ميرزو لگەل هندەك پەيا ل دېف شاخختىنە فەرىق پاشا چونە بارەگايى فەرىق پاشا پشتى دانوستاندىن لگەل شىخ كالو كرى و دگوتىنە شىخ كالو دېيت تو لگەل ئىزدىيىن دەفەرا دنا بوسلمان بىن ديانەتا وە نەيا دروستە و ديانەتا بوسلماندا ديانەتا خودى يە و رىيا راستە ئىكسەر شىخ كالو ئەف گوتىنە وى ب توندى رەتكەر و گوتى سەرىيەكە ل رىيما ئىزىيە و ئەز بەرخى كوزا ئىزىيمە، دەمى فەرىق پاشا ئەف ژ شىخ كالو بەھىستى ئىكسەر ئەمر دا سەرى شىخ كالو و ھەۋالىن وى برىن و دېيىز دەمى سەرى وان برىن نورەكاكەس و سور و زەر لسەر جەنازى شىخ كالو بلند بو و بەرۇ عەزمانا فرى ئا هوسا بو شىخ كالو سەرى خوه ل حەرفى دا و ب بىريارىن دەزمەن يىين گەنى قايل نەبو و گوشتىنە خوه قەبۈل كر ژ دەست دانى دىنى خوه قەبۈل نەكر و ب قىيىتەن ئەف دەلاوەرەن جەرك پولايى بونە سەرىن گەش ل ئەسمانى ئولا ئىزداتىيى و گەھشتەنە مىزازى ئاقۇنسى و ئىزدى مىرزا و مجوئ مالا شىخا و مەھمەد كەيا و گەلەكىن دن و بونە شەھىدىن دىن و مللەت 11. پشتى پلانىن وان يىين گەنى ل دەفەرەن شىخان و بن كەندى و قايدىا و دەفەرا دنا و ھەۋىریا سەر نەگرتىن و ئىزدىيىن چىايى شەنگالى را دانان ھەلبەت ئىزدىيىن چىايى شەنگال ئەف سەربورە و كار و كريارىن فەرىق پاشا يىين دەرى ئىزدىيان ئەنجام دايىن بەھىستۇن گەلەك پى دلگەران بوبۇن و ھەر ژ زودە كارى خوه كربۇن ژ بو بەرسىنگ گرتىن دەزمەن ئەگەر ھاتو فەرمان هاتە سەر وان . ئەو بو كورى وى عاسم بگ ھنارتە سەر ئىزدىيىن چىايى شەنگال ل چىريا ئىكى سالا 1892 ئ ز پشتى زانى ئىزدىيىن شەنگال نەرازىنە لسەر كار و كريارىن وى و

بهره‌دانیی ژئول و مللته‌تی خوه کرن و دهست نه‌دانین و شهر یی به‌رده‌وام بو ههتا پشتی عه‌سرا ئیشاره و فه‌ریق پاشا زیان و خساره‌کا ههرا مه‌زن ژ گوشتی و بریندара و تانک و توپا 18. و دهتی ئیریشیدا ژمارا گوشتیین له‌شکه‌ری فه‌ریق پاشا گه‌هشته (200) له‌شکه‌را و (40) کوشتی ژ نه‌فیر عامی ژ هوزین عه‌رها 19. ئه‌فی شهری ب هیز و دهوار سی شهـ و سی رۆزان یی به‌رده‌وام بو و ئیریشیدا ژیزدیان ب شهـی بون ژ به‌ر کو یین شاره‌زا بون ل دهفری و دهفری وان بو ب فی چه‌ندی زیانه‌ک مه‌زن ب له‌شکه‌ری داگیرکه‌ر دان 20. هه‌لبه‌ت د ماوی ڤان سی رۆزان ده‌من نکاری ئیزدیان بشکنت ب وان جه‌بلخانا و تانک و توپا ئه‌بوبو شهری گران که‌ته کورا به‌کرا و گه‌لیک کور بمبارک ولگه‌ل تاریبا به‌ری سبی و لگه‌ل ناف لیدانی و تلیلیا ژنان ده‌من شکاندن و ئیرش برنه سه‌ر چادر و لگه‌ل فریق پاشا ب رهـ به‌ز به‌رو ئوردیگایی خوه چونه بازاری شنگال پشتی گوشتی ژ له‌شکر و نه‌فیر عامی بون . پشتی فی شکه‌ستنی کار و کریارین فریق پاشا یین بی روشت و نامروڤانه ڈئیزدیان و دور ژ مروفاتیی گه‌هشته ده‌رگه‌هی بلند (الباب العالی) ل ستنبولی و هه‌ر دزودا ده‌رگه‌هی بلند (الباب العالی) لژنه‌کا فه‌کولینی شانده بازاری موسل و فه‌کولین لسهر کارو کریارین فریق پاشا کرن و شانده پی و گوتني دهیت تو ژ شنگال بهییه موسل و پشتی لژنه پشت راست بوی ژ وان زانیارین لسهر هاتن گوتن و گه‌هشته حکومه‌تا ئوسمانلى ل ستنبول ئیکسه‌ر بريارا دورئیخستنا فریق پاشا د له‌شکه‌ری ئوسمانلى دا ژ ده‌رگه‌هی بلند (الباب العالی) ل ستنبولی ده‌رگه‌ت ژ به‌ر هوڤانیا وي دزی ئیزدیان و پشتی فی برياری ئیکسه‌ر ل (25) نیسانا 1893 بی ئومید و روره‌ش زفري ستنبول ديسان ودکو مووفه‌ک تاوانبار دور بو ژکاری خوه و ب فی يه‌ک و ده‌می ئیزدیان ئهـ سالوخه بهیستی پی حال خوش بون و كه‌يغا وان هات ب فی

ده‌می ل فی جهی پیکله ل ههـ چهـیان و كومبون ههـلبهـت ئهـ چهـنـه د سـترـانـا فـلـکـورـیـا چـیـاـیـ شـنـگـالـ دـاـ هـاتـیـهـ ژـ وـانـ عـهـگـیدـ وـ مـیرـخـاسـیـ لـ فـیـ چـفـینـیـ بـ سـهـرـ كـرـدـاـيـهـ تـیـاـ سـفـوـکـیـ مـهـتوـ كـوـمـبـوـينـ ئـهـ بـونـ ( سـفـوـکـیـ مـهـتوـ ، دـاـوـدـیـ عـیـسـاـ ، حـهـمـوـ شـهـرـوـ مـحـهـمـایـ عـفـدـوـ ، ئـوـسـیـ مـهـزـدـیـنـ ، عـلـیـ مـلـحـمـ ئـاغـاـ ، مـحـمـودـیـ ئـوـسـفـ ، وـ گـهـلـهـکـیـ دـنـ )ـ كـوـ نـافـینـ وـانـ دـسـتـانـیـدـاـ نـهـمـایـهـ . تـفـاقـ دـنـاـفـبـهـرـاـ وـانـ دـهـاتـهـ كـرـنـ كـوـ سـیـ بـهـرـوـکـیـ شـهـرـیـ بـهـیـنـهـ دـانـانـ .

بهـرـوـکـیـ ئـیـکـ /ـ بهـرـوـکـیـ رـوـزـنـاـفـاـ بـ سـهـرـ كـرـدـاـيـهـ تـیـاـ عـهـلـیـ مـلـحـمـ ئـاغـایـ سـمـوـقـیـ كـوـ سـهـرـوـکـ هـوـزـ وـ ئـاغـایـ سـمـوـقـیـ بـوـ ئـیـکـ ژـ هوـزـینـ مـهـزـدـیـنـ چـیـاـیـ شـنـگـالـ ،ـ لـ گـهـلـ پـهـیـاـیـنـ هـوـزـاـ وـ هـوـزـینـ ئـالـیـ رـوـزـنـاـفـاـ وـدـکـوـ هـهـسـکـاـ وـ هـنـهـکـیـ دـنـ ژـ هوـزـینـ ئـاـنـجـیـ گـیـدـوـکـاـ رـوـزـنـاـفـاـ لـ بـارـیـ وـ دـهـورـوـبـهـرـینـ وـیـ وـ ژـ گـیـدـوـکـاـ رـوـزـنـاـفـاـ هـهـتـاـ بـ دـهـفـهـرـاـ كـهـرـسـیـ وـبـ تـاـیـبـهـتـ گـهـلـیـ كـهـرـسـیـ لـ ژـیـرـ سـهـرـكـرـدـاـيـهـ تـیـاـ حـهـموـ پـاشـاـ وـ هـوـزـاـ وـیـ هوـزـاـ فـهـقـیـرـانـ .

بهـرـوـکـیـ دـوـوـ /ـ بهـرـوـکـیـ رـوـزـهـلـاتـاـ باـکـورـیـ چـیـ بـ سـهـرـكـرـدـاـيـهـ تـیـاـ سـفـوـکـیـ مـهـتوـ وـ دـاـوـدـیـ عـیـسـاـ لـگـهـلـ هـهـمـیـ هوـزـینـ جـوـانـاـ لـ دـهـفـهـرـاـ بـکـراـ وـ مـهـرـکـاـ يـاـ كـوـ دـبـیـزـنـیـ گـیـدـوـکـاـ رـوـزـهـلـاتـ .

بهـرـوـکـیـ سـیـ /ـ بهـرـوـکـیـ باـشـورـیـ رـوـزـهـلـاتـیـ چـیـ بـ سـهـرـكـرـدـاـيـهـ تـیـاـ مـحـمـمـایـ عـهـفـدوـ ئـوـسـیـ مـهـزـدـیـنـ وـ ئـهـفـ بـهـرـوـکـ دـکـهـفـ بـهـرـامـبـهـرـ گـونـدـیـ مـهـرـکـانـ ئـیـزـیـکـ گـهـلـیـ بـیـرـینـیـ وـ لـگـهـلـ فـیـ چـهـنـدـیـ هـهـرـ بـهـرـوـکـهـکـیـ تـهـنـگـاـفـ بـوـ لـ دـهـمـیـ ئـیـرـیـشـیدـنـ دـهـمـنـ دـهـارـیـ کـارـبـنـ دـگـهـلـ ئـیـکـ دـوـوـ وـ دـهـهـانـ هـاـواـرـاـ ئـیـکـ وـ دـوـوـ هـهـرـنـ ئـهـگـهـرـ ئـهـفـ هـاـتـهـ دـاـخـازـکـرـنـ 17ـ .ـ هـوـسـاـ بـ فـیـ رـهـنـگـیـ بـهـرـهـفـیـاـ خـوهـ کـرـنـ وـ بـیـ ئـامـادـهـ بـوـنـ ژـبـوـ بـهـرـسـینـگـرـتـنـاـ دـهـمـنـ وـ دـئـیـرـیـشـادـاـ دـاـ کـوـ هـیـقـیـاـ لـ دـهـمـنـ بـدـوـنـ هـهـرـ هـوـسـاـ فـرـیـقـ پـاشـاـ چـادـرـ خـیـفـهـتـیـنـ خـوهـ فـهـگـرـتـبـوـنـ لـ زـوـرـ ئـافـایـیـ کـوـ جـهـهـکـیـ ئـیـزـیـکـیـ بـهـکـرـیـهـ وـ لـ سـپـیـدـهـیـاـ رـوـژـاـ ( 15 )ـ نـیـسانـاـ سـالـ 1893ـ فـهـرـیـقـ پـاشـاـ ئـیـرـیـشـ کـرـهـ سـهـرـ ئـیـزـدـیـانـ لـ بـهـکـرـاـ وـ شـهـرـهـکـیـ دـهـوارـ چـیـبـوـ بـهـلـ دـلـیـرـیـنـ ئـیـزـدـیـانـ بـهـرـ سـینـگـاـ وـانـ گـرـتـ وـ

گەل باب و برا مىرى چى بن لەپ ھلينىن ب خودى شىئور و تەكىبرا ۋان كورىن  
جومىرا كەته راسەرى گەلىي كەرسى ل بن دارا زقنى.

بەلى ل بن دارا زقنى، فى سې ئوسى مەزدىن كەكى كەمەيل ب سى دەنگا گازى  
دەكە مەحەمايى عەفدو بابى سالخ گەل باب و برا مىرى جى بن لەپ ھلينىن بەرى  
خود ژ بىلوكى عەسکەرئى فريق پاشا مەگەرىنە، عەرز و عەيال شىرىن مەرسىنە  
،گولى سورا ژ دەستى نەزامى فى سې ب فكىنە، بەلى ب خودى زانبە دەستى مە ژ  
گولى سورى مەقوت بو، ل دەستى مە دا نەما ژ غىنى ميراتى دارى تفننگا.  
هايى نايى هايى نايى هايى نايى، گەل جماعەتى ئەزى باندەم دەنگى من  
دەرنايى.

دەنگى توب و تفننگى عەسکەرئى فريق پاشا غالبي گرانە ئاگرى خودى بەردايە  
دنىايى مەندكانى خايىنە چوويە دخالەتى چوويە ھدايەتى چوويە راي، بەلى ئەزى  
چېكم دەنگى تفننگا عەل ئاغا بابى ملحم ژ گىددوکا بارى نايى ب خودى ژ قەدىم  
و زەمان خوركاني يە خايىنە رۆژا مرنى ئىمدادەكا مە ژبال نايى.

ئەزى كەتمە ديارى سلسلا چىل مىرلان ديارى سوکى، سى بىلوكى عەسکەرئى فريق  
پاشا غالب دىگرانى كەفتەن ئالىي گىددوکى، مە حمودى ئوسى سى دەنگا گازى دكە  
حەموى شەرو 32، ئوسى مەزدىن كەكى كەمال، داودى عيسا بابى داود بەلى ب  
خودى زانبە مىرى و دكە مەھمەيى عەفدو سوارى بوزى بابى سالخ گەل برا مىرى  
جى بن لەپ ھلينىن بەرى خود ژ نەزاما عەسکەرئى فريق پاشا مەگرىنەن مە  
تەلاقى ژن بەردانى ل مال دانىنە، ئەم ژپەي عەسکەرئى فريق پاشا فەناگەرن ما  
ئەم ل ئىشارا گوندا بەرى عەسکەرئى فريق پاشا بەدينە ئالىي كەركوکى.

لى دايى لى دايى ديارى من و كۈلەنە بەكرا واب بەرە خودى تو شاهدى سى بىلوكى  
عەسکەرئى فريق پاشا دانىيە سەر چەمى زوقاى گوندى گرى عەرەبا 33، بەرى  
توبى دانە بەكرا سەرمائى مەدا درژن وەكى مومان و چرا مەحەمايى عەفدو سوارى  
بوزى بابى سالخ ل سەكمان و تەقنىڭچى شىنگاليا دكەته گازى مىرى جى بن لەپ

برىارا سلتان ( عبد الحميد ) دەرئىخسەتى دۇزى فريق پاشا و كريارييت وى يى دور  
ژ روشتىن مروۋاتىي دۇزى ئىزدىيان 22.

### فەرمانا فريق پاشا دەستانا فلكلوري دا

ئەڤ دوو دەقىن سترانىنە يىن كو رووانىن فەرمانى وەكى دەرىمەنەت ژ مەرا خويا  
دەكتە. ھەلبەت ھەر دوو دەق و پەيقين وان گەلەك دەنیزىك ئىك و دۇونە و  
نَاوازى وان ژى ئىكە بەلكو كىيماسى تىدا ھەنە لى چاوا ھاتىيە گوتىن من وەسا دايە  
نەفيسىن ل فى دەلىقى ھېقى خوازم ژ ھەر خوندەقانەكى فى بابەتى ھوپى گرنگ  
و دېرىوکى ئەگەر ھندەك پېزنانىن دن و ھندەك دەقىن دن يى سترانى بەدەست  
وان بکەقىن بلا ژە و ژى بخىرا خوه بىنە نەفيسىن دا كو نەشىن ئىزدىيان يىن بەھىن  
زىدەت بىسر دېرىوکا خوه ياخوينا وى ھلبن داكو ئەۋۇزى ب پېتىن زېرىن ئەقى  
دېرىوکا شەرى بەرخودانى تومار بکەن و ل داوىي داخازا لى بورىنى ژ ھەر  
كىيماسىكى دكم بى گومان ئەڤ بابەتە پتەن من روناھى دايە ل سەر سەرھاتى و  
فلکورى پى ھاتى گوتى بەلكو ژ ئالىي ۋەكولىنى ۋەكى ئان زەنگىن تر لى بکەن و  
زىدەران و بەلگەنامان بەدەست خوفە بىن داكو ژ خەلکەكى را خوياكەن كا چەند  
زولم و زوردارى ل فى مللەتى ھاتىيە كەن مللەتەكى بى دەست ھەلات مللەتەكى  
تەننى مەرەما وى ئەو بوب سەربەستى و ئازادى و ئىمناھى بېزىت .

### ( دەقى ئىكى ) 24 سترانا شەرى فريق پاشا

لى دايى ئى ئى.. دنيا لە تەنگ بوبى سې وەكە تارا بىزىنگى، گەلەك ھەنە شادە  
و نشودى 25 وى داودى عيسا بابى داود 26 ملەمەن عەل ئاغا 27. گەل باب و  
برا فى سې خەبەرئى بەدەن مەحەمايى عەفدو بابى سالخ 28، وى سەفوکى مەتو  
بابى بەرجەس 29 بەلى ئوسى مەزدىن كەكى كەمەيل 30، مە حمودى ئوسى 31

هلينن ب ئزنا سلطان ئيزى ئەفرو ئەمى فى نەزامى بشكىزىن ب خودى ڙ نيقىرو  
پاشقه شهر كەته سەر دھرى كور بمبارك، سەر ميراتى داري برنوبي ووووو .  
ئيزىدۇوووو.. گولا كچك سى دەنگا دېيىر گولا مەزن 36 لى لى خوهينگى فى سې  
تو كارى خوه بکە ئەمى چىنه سەر بانى چىيل میران گيانى م ب گورى ديارى  
سوکى، خودى ئافا نەكه مالا فريق پاشا تار كوبارا سې خيفهت و چادرى خوه  
دانىنه ميراتى گرى گىدوكى .

شاده و نشودی نوسی مهڈین کہمیل گلهک ہئنہ سی دنگا دبیڑہ  
محہمایی عہدو بابی صالح سقوکی مہتو بابی بھر جس گھلی باب و برا میری  
چی بن لہ پھلین ب نے زنا سلطان نیزی ئہ می فی سبی فی نہ زامی بشکینین  
ئہ می بھری نہ زاما فریق پاشا بدنه میراتا کھر کوکی .

ئىزىدۇۋۇق.. كاڭلى بابى رەشۇ 37 ب شەوتى ب گەنەكە، كاڭلى بابى رەشۇ ب شەوتى ب گەنەكە، خودى ئافانەكە مالا فريق پاشا تارى كوبارا سې خىفەت و چادرى خود دانىنە ميراتى گرى دىرئى، يەك ب يەكە ل وى ميراتى گرى دىرئى يەك ب يەكە، شاد و نشودى ئوسى مەڙذىن كەن كەمىل كەلهك ھەنە، سى دەنگا بىزى مەھەمايى عەفدو بابى سالىح، سفوکى مەتو بابى بەرجەس گەلى باب و برا مىرى چى بن لەپ ھلينىن، ب ئىزنا سلطان ئىزى ئىرو ئەمىنى ئىزامى بشكىنىين ب خودى ئىزى باشقە ناموسا خودى يە، ناموسا مىزايى مالا كوچەكە

لی دایی لی دایی لی دایی ...  
دیاری من و کوّلانا به کرا ب شه و قی واب به ره م دی ل قی به یانا به ری سبی سی  
بیللوک عه سکه ری قریق پاشا دانینه ل سه ر چه می زوقایی، گوندی مه گری  
عه ره با، به لی ب خودی زانبه به ری توپا دابونه به کرا، گولی میراتی توپا ل سه ر  
مالی مده درژن و هکو مو مان و چرا، مدی ئوسی مه زدین که کی که مال سی دهنگا  
کازی دکه، مه حمودی نو سف داویدی عیسا بایی داود، ئه وی سقوکی مه تو بایی

هلين بھلی هونی به ری خود ڙ پھی عه سکھری فريق پاشا مگه رين نه زامي  
بگوڙن في سڀ ميرا بگوڙن دهربئ لی بخين عافهرم ميري و هکه محه مايي عه فدو  
بابي صالح بهلی ب خودي ل عه سرا ئيچاري تانا شوري زراف ب سواري تا ژوته ناف  
جادرا.

لی دایی لی دایی، دیاری من کولانا بهکرا وا ب کاشه ئەری ب خودی دانینه سەر  
چەمی زوقاى 34 گوندی مە گرئ عەرەبا سى بىلۇكى غالبى گران بىلۇكى  
عەسکەری فریق پاشا، گرینى كەته توپا خەرینى و نالینى كەته میراتى ۋان رشاشا  
ل، دەستى پەيایى شىنگاليا كەتى هادى پاشا میراتى بىشە تاشا بەلنى ب خودی  
كەته كۆزكا، متەرسا بەلنى عەسکەر مەشكىر ل ئالىي غەربى گەھشە گرگا عملى  
باشا، ل ئالىي شەرقى كەته جەمی رەشە سى دەنگا مەحەمايى عەفدو ل داودى  
عيسا دكتە گازى برا مىرى چى بە رۆزا میرايە لەپ ھلينە چاقى خوھ ژنەزاما  
فریق پاشا مەگەرىنە ئىزنا خودى و رب العالمين ئەمى عەسکەری فریق پاشا  
خەلاس بکەن ئەمى بکىن سالەكى و سى ھەيقا قوج و عەرەبانى حکومەتى ل  
جەمی يەكرا خەلاس نەكەن مە يتان و لاشا.

هایی نایی هایی نایی، گهله برا نهادن کم دهنگی من در نایی دهنگی  
توب و تشنگی عه سکه هر فرق پاشا یی غالی گرانه ئاگری خودی به رهابویه  
دنیای بهلی ب خودی مهند کانی یه خاینه چویه دخاله تی، هدایه تی، چویه رای ز  
قه دیم و زه مانده نه زی چبکم خوده کانی یه خاینه وختن پیلی خوینی راد بن  
لاشان و مهیتا لیهر خوه تینن توجارا پیمدا ده کا مه ژ بال نایی .

دھقی دووی 35 سترانا شہری فریق پاشا

ئىزىدۇۋۇق.. م دى ئوسى مەڙدىن كەكى كەمېل ب سى دەنگا دېيىرە مەھەمايى عەفدو بابى سالح سفوگى مەتو بابى بەرچەس گەلى باب و برا مىرى حى بن لەپ

ژیلدر و پهراویز:

+ فرمان: ب زمانی ئۆسمانى بىريارا كۈز دەركەفتى، بىلند دەركەفتى، و ئىزدى ب رامانەكا جودا د فىن پەيپەن دەگەن، ئەو زى ب مانايى (ھېرش و ھەۋىن قىرकەن و جىنۇسایدەكىنى).

1. ئىزدىياتى/ وانه بۇ قوتاپىيەن ئىزدىيان/پۇلا حەفتى.

2. ۋ زارادەتى كاك عمر أوسمان قاسم، ۋ ئاڭنجىي كۆمەلگەھا بېرلەك.

3. رېسان حسن، المرأة الإيزيدية وموقعها في المجتمع / گولان العربى 39- اربيل 1999- ص 92.

114 2009 . . . . .

252 - 1927 / / / / .

زىان... ڙىيەرى بەرئى، روپەل 115 . . . . .

/ 152 - 1980 . . . . .

.90 2000 (12) - . . . . .

- 1998 ( 82) . . . . .

. . . . . 102 . . . . .

8. ئوردىخانى جەليل، زارگوتنا كوردايا تارىخي، بغداد 1977 ص 29 .

9. سعید خديدة ڙىيەرى بەرئى .

10. دولب گوندەكە دەكمە رۆزھەلاتى بازىركى سىمېلى ب دوراتىيا 5كم .

11. ئەف سەرھاتى من ڙ زارادەتى شىيخ داود شىيخ جندى نەقىي شىيخ كالو وەرگرتىيە .

12. صديق الدملوجى، اليزيديه - ص 507 سعید سلو گۇشارا رەوشهنىرى نۇ ژمارە ( 121 ) - بغداد ئادارا 1989 روپەل 189 .

13. دملوجى: ڙىيەرى بەرئى، بنىرە سعید خديدة - ڙىيەرى بەرئى .

14. على الوردى، لاحات اجتماعية من التاريخ العراق الحديث، بغداد 1927 - ص 252 .

15. دملوجى ڙىيەرى بەرئى .

16. سعید سلو - ڙىيەرى بەرئى .

17. ئەف پىزازىنىن ڙ زار دەقى بەریز مۇ پىر خلف داسكى كو نەقىي ( ئوسى مەزدىن ) ئىكە ڙ عەگىدى ئى شەرى و نەا ئاڭنجىي سنونى يە .

18. ئەف سەرھاتى ڙ زار دەقى بەریز مۇ پىر خلف هاتىيە ئىشىسىن .

19. د. عدنان زىان... ڙىيەرى بەرئى .

20. : . . . .

د. عدنان زىان... ڙىيەرى بەرئى .

21. . . . .

22. دملوجى: على الوردى ڙىيەرى بەرئى .

23. دملوجى: على الوردى ڙىيەرى بەرئى .

به رجهس، علمی بدهن مجه‌مایی عه‌فدو بابی صالح سواری بوزی و برهک خورتین شنگالیان گهلى باب و برا لهپ هلینن به‌رئ خوه ژ نه‌زاما فريق پاشا مه‌گه‌رين، عه‌رز و عیالین شیرین مه ترسین، گولی سورا ژ دهستن نه‌زاما فريق پاشا ب فکينن، بهلی خودی حادر دبیزن میری و که مجه‌مایی عه‌فدو بابی صالح ل عه‌سرا ئیفاری تانا شیری كراس تازی تازوته ناف چادرا.

نیزیدوووو.. مانه حاله کی مه نه ما گهلى هوگران و هه فلا بنیر کولانا به کرا وا ب  
کاشه، من دی ل به یانا به ری سبی دانینه سهر چه می زوقایی کوندی گری عه ره با  
سی بیا لوک دگران ژ عه سکه ری فریق پاشا، نالینی که ته میراتی ره شاسا ل ئالی  
غره بی را پیشیا عه سکه ره مه شیا گه هشته گر کا عه لی پاشا، به لی ل ئالی شه رقی را  
پیشیا گیدوکی گر که ته چه می ره شه، مدی مجه مایی عه فدو بابی صالح سی دهنگا  
ل خورتی شنگالیا که ته گازی، گهلى گولی سورا باب و برا میری جی بن له پ هلین  
ئه نیشکا ب کوتن ل کوزکا، خه ندکا ۋا مە تەرەسا، به لی ب ئىزنا خودى و سلطان  
نیزى ئەزى بكم ساله کى و سى ھە يقا ل چه می به کرا قوج و عه ره بانی حکومە تى  
خە لاس، نە كەن حناز و لاشا .

فی جاری زهريفا ئوسى دېئزى لى لى گولى خوهينگى ئەز بان دكم دەنگى من  
دەرنایى، بەلى ئەزى بان دكم دەنگى من دەرنایى، دەنگى توب تەنگى عەسکرى  
فرىق پاشا ئاگرى خودى بەردا بويه دىنايى، مەندكاني يە خاينه چویه هدایەتى  
دحالەتى، چویه رايى ئەفه سى رۆزى تەمامە ل وى گىدوکا غەربى دەنگى عەلى  
ئاغا بابى ملحم توجار و توجارا نايى ب خودى ژ قەدىم و زەمان خورەكانى يە  
خاينه رۆزا مرنى تو جارى ئىمدادەكما مە ژ يال نايى.

## پراکٹیزہ کرنا سہ روایا قہ ولیٰ

"ئافراندنا دنیاپی"



کوْفان خانگی / زانکوْیا دهُوك

پیشہ کی:

هر ته کسته‌کی ئەدەبی فۇرمەکى خوھ يى تايىبەت ھەمە و ئەگەر ئەم فۇرمى قەھولى يان تەكستەکى وەکو شعرى وەرگرن؛ ئەڭ فۇرم كۆمەكا تىشان بخوه فە دىگرت، ل گۈرهىي بۇچۇن و نەرينىيەن رەخنەگاران دىيت و بۇچۇنىي جودا دەرھەقا فۇرم و نافەرۆكى و پەيپەندىيان وان ھەمە، دىناۋە فۇرمى يان ژى پېتكەھاتىن فۇرمى

24. دهقی فی سترانی ژ کاسیتهکی هاتیه و هرگرتن بدنهنگی سترانبیز خیر و شنگال و ل سالین نوتاندا دهستی رژیما ژ ناٹ چوی هاتیه سیداردادن .

25. یا دورست شاده و شهود .

26. بابی قاره‌مانی بننا و دهنگی چیایی شنگانی داوید کوری عیسا کوری حسو کوری ئادی دهلا، بینیره سعید خدیده، من مشاهیر الکورد، داود الداود الشنگانی، لالش (15) دهوك نیسانا 2001 .

27. ناغای هوزا سموقیا بو نیکه ژ هوزین همه رمه زن ل چیایی شنگانی و پیزیما وان د ئاکجینه ل کومه‌لگه‌ها دووگری .

28. سرهوکی هوزا ههبابا بو ئەھه هوز ژی ژ هوزتین همه رمه زن ل باشوری چیایی شنگانی و ل وی دهمى دېیزىن ژی مەحمامایی عەھدو نیزیک حەفتى سالان بوبو.

29. سەرکەردەپىن هەرە مەزىن دەپى فەرمانىدا و سەرکەپشىا ئۆزىدیان دکر دەمى دان و سەستاندىن لگەل فريقي پاشا هاتى كرن ژ زاردهفى مەو خالتى كونها ئاکجىي كومه‌لگەها بوركە .

30. نافى وى يى دورستى نۇسى كورى پېر مەزىن ز بېرىن پېر ئاي یە ژ هوزا محاوپا باب و كالىن وان ژ قەراجچى داسكا ژ تورا هەفيئىر کا ژ كوردىستانا باكىر ژ بەر زولم و زورا ترکا هاتبونه چیایی شنگانی . مەو پېر خلف ئىدەرى بەرى .

31. ژ هوزا بەکارا یە ژ مالا ئوسى دوغو، نافادارە ل ئىزىدەخانى .

32. ب پاشايى چیایی شنگانلى نافادارە .

33. ئەھ گوندە دەكهفە ئېرى جەمى زوقاڭى ل قۇنتارا قەراچى قەرە هەنجرى و نیزیك گوندى بەكرا . ژ زار دەھى كىرت قاسم مەھركانى ئەھ پېزنانى من ودرگرت .

34. روبارەكى ئافى بول وی دەمى نیزیك گوندى بەكرا .

35. دەھى فی سترانى هاتىه و هرگرتن ژ کاسیتهکى بدنهنگی سترانبىز لاجىن و خир و شنگال .

36. دوو شىرە ئەننەن خەلکى گوندى بەكرا بون .

37. ژ بنياتدا وارى رەشۇ بول رەشۇ كورى مېزايى كۈچەك بول ئەھف كاڭل ل گوندى بەكرا بوبو .

38. ل بېيى گوتتا مېزايى خويدا كۆنەن ئەھپىن مېزايى كۈچەك و نەنە ئاکجىي كومه‌لگەها زورئاڭىي يە دەگوت ل وى دەمى مېزايى مالا كۈچەك چو بول گوندى بەكرا و مەھرەك ژ بۆ خرفەكىدا خيرا كۈچەك بېرىھيم ژ ناٹ مەرىدا ئەهو بول شەر و فەرمانى دەست پى كەر و ئەھۋىزى مل ب ملى وان عەگىدا شەرئى بەرخوددانى كەر و داخواز ژ خودى كەرسەد كۈچەك بېرىھيم بەدەته ئۆزىدیان و دەزمەن بېشىن ئەھ بوبۇ وئى هېزىا مەزىنە ئۆزىدیان دەزمەن شەكاندىن .

39. ز مالا ئوسى دوغوئە .

\*سوباس بۇ بەریزان (سعود عبد خدیدا) و (نيجيريان شيخ سقوك) بۇ ھەندەك پېزنانىدا دۇر فى قەرمەنلى .

دیاریزیت، ژ بهر کو سهروا ریتمه که ل سهرا دوو ستریسین خودجە راوهستیایە، ئىك ل سهرا روایی، و یا دى ل سهرا راوهستیانى".<sup>9</sup>

ھەر وەسا روئى سهراوایی ناھیتە کورتکرن د مەسەلەیە کە جوانکارى دا، خوه ھەگەر ۋى ژى بىمەت؛ يان بۇ خەملاندىن بېھىتە بكارئىنان؛ بەلكى دەربازى مانايى دېت و پەيەندىيە کا ئۆرگانى ل گەل لەشى دەقى شعرى ھەمە، ل دوو دەربېپىنا (جان كوهن) ژى؛ "ھەگەر دېبىۋەنلىغا وى يا ب مانايى ۋە نەبەت؛ روئى وى يى راستەقىنە دیار نابات"، بەلكو دى تىن مەسەلە کا دەنگى دوور ژ دەلەتى بەرچەستە كەت، ئەفە وسا دىتە تەقەرقە کا بى مانا<sup>10</sup>.

نەرين و پىناسىنە کە دن ژى دەربارەي سهراوایی دیار دكت؛ "سەروا لە كۆمەلتى فۇنىم كە لە كۇتايى نىيۇددىر يان دېپى شىعريدا (بە پىيى قالبى شىعىرە كە) جى دەگرن و لە رووى دەنگەوە يەكسان و لە رووى واتاوه جىاوازن و دەبى بە كەمى بىزروكە يەكىان تىيدا بېت و درېڭايىيە كەشى دەكىرى لە پېتىك تا چەند و شە بېت".<sup>11</sup>

(د. عەزىز گەردى) دېيىت: "سەروا يىا ھۆزانى دەۋازانا كوردى دا نە وەك يَا عەرەبى يە، چونكى سەروا د ھۆزانان كوردى دا نەك بتنى ل سەر بىنیاتى (رمۇي) يَا نەبزۇين دەھىتە ئافاکرن، بەلكو ل سەر بىنیاتى پېتا بىزۇندا درېئىز ژى دەھىتە ئافاکرن، وەك: (ئى، قۇ، وو، ئى، ئى). ئانکو دەستىنىشانكىرنا سەروا يىا ھۆزانى دزمانى كوردى دال دوو پېتا (رمۇي) كېيم و كاسى تىيدا دیار دېن، دىسان ھەمان دىتنا د. دلشاد عەلە يە ھەبىي، دەمما دېيىت: "دزمانى كوردى دا بىزۇندا درېئىز ب تىن ژى دكارت سەنگا سەروا يىا راگرت".<sup>12</sup>

د چاڭانىيەن رەخنەبىي (كەفن و نۇو) دا، سەروا ھەر دەم دەگەل كېشى ھاتىيە بەحسىرن وەك ئەدگارەكى سەرەكى ژ بۇ ھۆزانى و دراستىيى دا سەروا رەگەزەكى گەلەك گەرنگە دەۋازانى دا، و "ھەر چەندە د پىناسەيىن تەقلیدى يىن شعرى دا كېشى ب پەلە ئىك و سەروا يىا ب پەلە دووب مەرجى شعرى دانىيە؛ لى گەرنگىيَا

دا ئەم دوو تاشتىن ھەرە دىيار دېيىن، ئەو ژى "كېش و سەروا" "ھەنگە ژى ب تاشتەكى گەرنگ نىزانن".

ئەگەر ۋەگەرن سەروا يىا ژى رۆلەكى گەرنگ د دەقى وەكە قەولەكى ئىزدىيان، يان ژى دەقەكى شعرى دېيىت و روئىن خوه يىن جودا دىگىرت و يىن ھەرە دىيار ژى راوهستىيان و ئاوازا وى يە.

قەول و بەيتىن ئىزدىيان بى تەكىن ئەھاتنە دارىتىنە، ئەو ژى دا كە باندۇرا خوه ل سەر وەرگەرى پەيدا بكت، يان ژى تاشتەكى رېك و پېك و رېكخىستى ژى دەركەفت و ژ بۇ ژېرەكىنى و ھلانىنى دئاسان بن و باندۇرا خوه بىكە سەر دەررونى وەرگەرى، ل ھەمبەرى ۋى يەكى ژى ۋەكۈلىنىنى كەنارى نەھاتىيە كەن، لهوما ئەز نەل سەر دەنىسىم و ھېقىدارم ئەڭ دەستتىپەك بىت ژ بۇ ۋەكۈلىنىنى ئاكادەمى.

#### چەند نەرىنەك دەرھەق سەروا يىا:

سەروا لايەنلى دووئى يە دەھەق كېشا موزىكا شعرى دا پشتى كېشى، و وەكە "شىرىكا كېشى دەھىتە ھئىمارتن"<sup>1</sup>، و تەھەرەكى گەرنگە ژ بۇ پىكەننانا فۇرمى دەرفە يىن ھۆزانى و "پېيەكە كە ل داۋىيا ھەر دېرە شەرەكى دەھىت، نەكول داۋىيا رېزى<sup>2</sup>، و ئاوازەكى مىندا روحى دەد بەر شعرى<sup>3</sup> و دابىرەكە مۇزىكى يە".<sup>4</sup>

سەروا ژ بۇ راگرتنا موزىكا دەرفە يَا شعرى "لە كېش كارىگەرتە".<sup>5</sup> و "مەر جىكى گەرنگ و پېيىستە بۇ شەيرى كوردى"<sup>6</sup>، و عەرەب ژى ئىك ژ "گەرنگتىن رەگەزى شعرى يى سەرەكى دەھەزەمىرن".<sup>7</sup>

سەروا مىندا دئىنسكۈلپىدىا بىرىتانى دا هات؛ ھنگى دورست دېيت؛ "دەملى دەنگى بېگە يىن دوماھىي يىن دو پەيچان يان زېلەتىر ئىك بىت و ب رەنگەكى وەسا بېھىنە دانان كە ھەر ئىك دەنگە دانان يا دى بىت"<sup>8</sup>، و گەرنگىيَا خوه ج دشعا كەفن يان يا نۇو دا ھەبىي، چونكى سەروا "ھەمۇ مۇزىكا مالكى يان رېزكە شعرى

- |   |                            |
|---|----------------------------|
| B | دەستوور دا قەلەمىن قۇدرەتى |
| B | ئەم ئافىتن ناڭ سۇرۇ موبەتى |
| A | لالش ژۇر دا ئانى خوارە     |
| A | لالش بۇو خاش، جى و وارە    |
| B | ل ئەردى شىن بۇو نەباتە     |
| B | پىزىنى زېنىدى قىياتە       |

2- چاربەند (چوارينا خەساو)<sup>17</sup>: ئەو جۆرە ب فى رەنگى يە؛ ئانکو ژەر پارچەكى (كۆپلەكا چار نىقە دىرى) تىنىزكى سى يىن يە جودايىيە، دەھولى ژى دا دەھىتە بەرجەستەكرن:

- |   |                          |
|---|--------------------------|
| A | يارھبى دونيا هەببۇو تاري |
| A | تىدا نەببۇ زېنىدارى      |
| B | تە زېنىدى كر تەزە حالى   |
| A | چۈنەكا گول ژى بارى       |

هەرسا سەبەقەكا دن دەھىتە بەرجاڭ ل جىيىن رېزكى سى يىن يە جەھى بىت، رېزا دووبيى جەھى يە:

- |   |                              |
|---|------------------------------|
| A | خوداھەندى مەھۆستايىي رەھمانى |
| B | رئى و دەرگەيىي دونيايىي فەكر |
| A | ھەرتشت ژەمپا دەرئانى         |
| A | بۇو بەھوشت ئەمرد و ئافانى    |

سەروايىي كەفنتەرە ژ كىشى<sup>13</sup>. ژ بەر كو " مەرۆف دكارت د ھندەك جۆرىن ھۆزانى دا و ب تايىبەت ژى يَا نووخواز دا كىشى بكارنەئينىت، لى مەرۆف نكارت دەست ژ سەروايىي بەردت، چۈنكى ل وى دەمى دى بىتە پەخشانە شعر"<sup>14</sup>. و ھەرسا " شعر ژى ب موزىكا باش جوان دبت، دىسان لازماز ژى دبت ئەگەر موزىكا وى يَا باش نەبىت"<sup>15</sup>.

### جۆرىن سەروايىي و پراكتىزەكىن ل سەر قەمولۇ ئافراندنا دىنياپى:

مە ج مىتۆدەكە دىياركى نىنەتە كەن كەن قەھولىن خود بىن پېرۋۇز بەھەرە پت يَا وان د سى رېزكىنە ل سەر ئانالىزە بىن، تەنلى ئەم دكارن پاشتبەستىنى ل سەر وان جۆر و رېكان بىن يىن دەقى شعرى ل سەر دەھىتە شرۇفەكىن، ئەفە ژى وەكە رېڭ و مىتۆدەن كەن يىن رەخنا ئەدەبى، ئەگەر ئەم تەماشەيى ئەدەبیاتا كوردى و ھەتا ھەنەك مللەتىن دن ژى بىن دى بىن گەلەك تەكىست ب پارچان و ئەو پارچە ژى ل سەر چار رېزكان دپارفەكربىنە و وسا ھاتىنە شرۇفەكرنە، قەھولىن ئىزدىيان گەلەك د چار رېزكىنە و ژ ناڭ وان قەمولان ژى ئىرۇ مە قەمولۇ ئافراندنا دىنياپى يان كىناتىيەلبىزارتىيە، لەوما ئەم دى وان پارچىن د چار رېزكى ل دوو ياشىرى چىن، ئەو بخوه گەلەك جۆر ھەنە؛ لى جۆرىن د قەمولى دا بەرجەستە دبت ئەم دى و دىياركىن:

1- جۇت سەروا: ئەو جۆرى سەروايىي يە ب فى رەنگى (DD,CC,BB,AA...) دەھىت، ھەر دىرىدەكە ھۆزانى سەروايىيەكە سەرېبەخۇ ھەيە، ئەف جۆرە "پت د داستان و چىرقىكىن ھۆنەرى دا ھەيە"<sup>16</sup>، ھەرسا د قەمولى ژى دا بەرجەستەكرن دبت:

- |   |                        |
|---|------------------------|
| A | ئىزدانى مە ب رەھمانى   |
| A | حسن و جەمال ژەمپا ئانى |

## A هات ل قالبی ئادەم دا ھیورى

7- سهروایا ئازاد، يان ئازادى د سهروايى دا و پراكىتىزەكىندا قەولى ئافراندىنى دنياپى:

سهروايى ھەموو ۋان ياسا و جۆرىن سهرواييان، ئەگەر دەق شعر بىت؛ زۆر جاران ھەلبەستقان ھەلبەستقا خوه ناكەتكە دج چارچۇقە و قالبىن سهروايى دا و ب رەنگەكى ئازاد دادنىت، لى ئەگەر ھەلبەستقان قىن بىكت؛ دى سەرەدەرى دگەل ھېئىتە كرۇن وەك شعر؟ ژ بۇ بەرسىداندا قىن پېسى ژى دەپتىت مەرۋەز زۇو ب زۇو بەرسقىن نەدەت، ژ بەر كو ھەگەر ھەلبەستقانى پېڭىرى ب سهروايى نەكەر مەرۋە تەماشەيى پېڭەتلىك دى يېن شعرى بىكت كا تاچ پادە دان و ستاندىن ب وان رەكربىيە و ب تايىبەت ژى كىش، ژ بەر كو ھەردوو دوو سەتونىن سەرەكى و دىيارن دشۇرى دا، ھەرسا ئەگەر دەق قەولەك بىت يان بەيتەك ژى بىت؛ زۆر جاران قەولقان يان بەيتقان خوه ژ قەيد و بەندىن ھەنك رېكىن بەرتەنگىن ئافراندىنى دېت و بەرھەمى خوه ب ئازادى د ئافرينت.

سهروایا ئازاد دەھىتە پىناسەكىن و دېتە ئەو جۆرى سهروايى "كە خۆى بەھىج قاللىبى دەرەوە نابەستىتە وە ھاتنى بە پېسى ياساى دەرەوە نېيىھ، بە پېسى ھەست و نەستى شاعيرە، بە پېسى دەلالەت و دابەشبوونى رېستە و دەستەوازى شىعرەكەيە<sup>19</sup>، و ھەلبەستقانىن كورد ژى "بە شىوهەكى دىيار و بەرچاپ روپيان كەردىتە بەكار ھەنئانى سهروايى ئازاد و پەرمىان پېڭاروھ"<sup>20</sup>.

سەرەرەيى ھندى قەولقانى ب چەند شىۋەييان دورستكرنە، لى پېڭىرى ب جۆرەكى سەرەرەيى نەكرييە، و دەق قۇولى دا چەند جۆر پەيرەو كرييە، مەرۋە دكارت بېزت خودىيى قەول دەق قەولى دا جۆرە ئازادىك دايە خوه، ھەر پارچەكى ب ئاوايەكى سەرەرەيى دادرېزت، (د. معروف خەزىنەدار) ژى بۇ ئەفى يەكى دېزت: "خو

3- چارخشتەكى: ئەڭ جۆرە ب فى رەنگى يە؛ (BBBC،AAAB)، و بەھرا پەت نېھەدىرىن وئى ل بەرامبەرى ھەڭ دەھىن، ئەھە ژى ب تىن رېزا چارى يە جودايە، لى ئەگەر تەماشەيى قەولى بىن دى بىن پارچەكە قەولى يَا پېچەوانەيى فى ياسايى، ئانکو ل جەن كو رېزكە چارى يَا جودا بىت، د قەولى دا ئەڭ جۆرە بەرچاڭ نابت، بەلكو يَا ئىيىك يَا جودايە، ئانکو ئەم دكارن بىزىن بەرۋاھىزيا چارخشتەكى يە و ھىلكار يې بەرۋاھىزى يە:

- |   |                        |
|---|------------------------|
| A | ئىزدانى مە دور دەرئانى |
| B | مۆبەت ئافىتە نافى      |
| B | ژى پەيدا كر دوو چاڭى   |
| B | ژى ھەركى پر ئافى       |

4- دوو بەھىت (چوارينا تەمام)<sup>18</sup>: ب فى رەنگى (BBBB،AAAA) دەھىتە چىكىن؛ د قەولى دا ھاتىيە:

- |   |                         |
|---|-------------------------|
| A | خوداھىندي مە تىشى دىساھ |
| A | دۇردا كاسى ژى كر ئەساسە |
| A | ژى پەيدا كر مىرى خاسە   |
| A | گۇت: "ئەھە ھى نە بەسە". |

- |   |                          |
|---|--------------------------|
| A | و باندا روح ھەدرى        |
| A | ھات و چۇ بەرلى           |
| A | نۇرا مۆبەتى ھنگافته سەرى |

بهندنەگردنى شاعير بەيەك قافيه، بۇ ئەمەدە كە زياتر ئازاد بى لە دەركىرىنى بىر و باورى".<sup>21</sup>

### B ئازۇتە لالشى گۆت، "ھەق وارە"

- |   |                                     |
|---|-------------------------------------|
| A | ئىزدانى مە سەفينە چىكىر             |
| B | ئىنسان و حەمیوان و تەپیر و تو       |
| A | جۇت بى جۇت ل سەفينى كر              |
| A | خوداھەندى مە ب رەحەمە               |
| A | دىار كر ساز و قودوومە               |
| B | نافىنە ئادەم و ھەفت سورا زۇر تەخوبە |

ھەر چەندە ئەڭ سەبەقا داوىي ھەر سى ب "د" ب داوىي بۇونە، لى ئەگەر ئەم پەيقات بىزقىرىنە ئەسلى وان "رەحەمە = رەحەم، قودوومە = قودووم، تەخوبە = تەخوب"، دېينىن چاوه رىزا يەكى و دووپى ب تەنلى سەرواھەيە كۆ ئەو ژى دەنگى م".<sup>5</sup>

سەرەتايى ۋى سىستەمى ژى سەبەقەك دەكەفە بەر چاڭ سەروا تىيە نىنە، تەنلى دەنگى وان "ش، ڙ" دىنېزىكى ھەڤن، ئەم دكارن ۋى سەبەقا بى سەروا ژى ب سىستەمى ھە گىرىپىن و ل بەراھىيى يان دوماھىيى دان، چونكى كا چاوه د ماتماتىكى دا سفر ژى قىمەتەك ھەيە ئەو ژى وسا:

دەست و پى كە لەش  
لى شرین كر گۆت و بىز  
شەۋەكىدا سەرواپى دئاستى دەنگى دا: ل ۋى رى دى تەنلى پەيقا سەرواپى ژ سەبەقەنى دەستنىشان كن و دەنگى بەرى سەروا، دەنگى سەروا و دەنگى پشتى سەروا دەستنىشان كن:

سەرەتايى ئازادىيى قەولانى د ئافراندىن قەولۇ خوھ دە ناهىيە ئىنكارىكىن يى ئازاد بۇويە و ھەر سەبەقەك يان ھەر چەند سەبەقەك ل گۆرەيى رىيەكى ئافراندىن، ئەفە ژى ل گۆرەيى تەكسىتى ئافراندىن دىنيابى يى ل بەر دەستى مە، چونكى تەكسىت ئۈرچىنال نىنە و ل سەر زارى ھاتىيە ۋە گوھاستن و بى گومان ب ۋە گوھاستنى ژى و بۇ ماودىيەكى درىز دى گۆرانكارىيىن مەزن ب سەردا ھىن، لى كا تەكسىت چاوه ل بەر دەستى مە يە ئەم وسا شەۋەقە دکن.

ژ بى وى ئازادىيى د سەروايىيا قەولى دا دىار دېت، ئەم دېينى ئەو سەبەقىن قەولى يىن سى رىزى ژى ھەر يەك ب سىستەمەكى ھاتىيە ئافراندىن، دەھەمان دەم دا ئازادىيى دەتكە خوھ و سىستەمەكى دن ژ مەرا دورست دكت كۆ وەكە دەرەجى يە، ب نەرينەك دن: سەبەقا يەكى ھەر سى رىز ئىك سەرواھەبۇويە و ج نە گەورىنە، سەبەقەك دن: رىزكا ئىكى دەگەرت، سەبەقەك دن: رىزكا دووپى دەگەرت، سەبەقەك دن: رىزكا سى يى دەگەرت و د سەبەقەكى دا سەروا ژى نىنە، لى نە يى رىكخىستى يە ل گۆرەيى ئۆرگەنايز و تەسەلسلا وى، ئانكۆ ئەڭ سەبەقىن ل خوارى يىن كۆ ژ كنارى سەرواپى ۋە د ئۆرگەنايزكى ھەر سەبەقەك ل جەھەكى بۇويە:

- |   |                           |
|---|---------------------------|
| A | سلطان ئىزىد خوش رېبەرە    |
| A | لاش كرە رىكى بە شهرە      |
| A | نها ئىزدىيا ژى خەبەرە     |
| A | خوداھەندى مە سەفينە ئازۇت |
| B | ژ كنارى چۇ بەر كەنارە     |

وکه دبینن کو په یقین "تونه، بنه و تونه" په یقین سهروایینه و په یقا "بوو" (کاری رابردوویی دوور)، وکه په یقا پاش په یقین سهروایی هاتییه، و په یقین بهری سهروایی ژی "بی، ژی" ئه فه ژی ل گورهی بوجونا وان نفیسکاران ئه مونین دبیزن ۋاولەكا درېز دكارت سهروایی دورست بكت، ھەردىسان وکه ئەم دبینن په یقین سهروایی دوو ژی د وکه ھەفن و ژ بۇ ئىك مەردم ھاتنە، ئەو ژی "تونه" د رېزا ئىكى و سى يى دا ئه فه ژی وکه ئىك ژ كىماسىيەن سهروایی دھىتە ھەزارتن.

### لەنگىيەن سهروايىي يىين د قەولى دە بەرچاڭ دىن:

ل گورهی نەرينا گەلەك رەخنەگرین ئەدەبى، دەمما دوو پەيىش ب ئىك مان د پارچەكى دا دووبارە دېت؛ ئەو كىماسىيەكە، ژ بەر كول گورهی نەرينا وان ئەو په یقین سهروایی يىين ژ كنارى فۆرم و مانايى ۋە د وکه ھەۋە خەوشىيى ژ وەرگرى را پەيدادكەن، ئەگەر ئەم پەسەندا ۋەنەنلىك بەن و ل سەر قەولى خوھ يى ئافراندىن دنیا يى بەرچەستە بەن، ھنگى ئەۋە يەكە دەكەفتە بەرچاڭ:

كەرامەتا خوداھەندى مە ھاتە خوارى  
ئەرد و ئەزمان ددن خىرى  
ھوين ژى بىن خودانى خىرى  
قەت ژ بىر نەكىن ۋە خەبەرى

وکه دبینن پەيىشا "خىرى" ل نىيەدەپەردا دوو و سى بىن ب يەك فۆرم و يەك مانا ھاتىيە و ب فى يەكى ژى وکە يەك ژ كىماسىيان تى حسابكەن، ژ بەر كو چىزرا سەرروايى ب دورستى نادە وەرگرى.

سلطان ئىزىد خوھش رېبەرە

لاش كە رىكى بەشەرە

نها ئىزدىيا ژى خەبەرە

وکه ديار په یقین (رېبەرە، بەشەرە و خەبەرە) په یقین سەرۋانە، و دنافا ۋان په یقین سەرۋايى دا دەنگى بەری سەرۋا، دەنگى سەرۋا و دەنگى پشتى سەرۋا ھەنە، ب فى رەنگى ل خوارى يە:

دەنگى سەرۋا	دەنگى بەری سەرۋا	دەنگى بېشى سەرۋا
ر	د	د

شەرقەكىن سەرۋايى دئاستى پەيىش دا: ئەم د كارن ل سەر ئاستى پەيىش ژى سەرروايى شەرقەكىن و ل گورهى پەيىش (سەرۋا، بەری سەرۋا و پشتى سەرۋا)، ھەنەك جاران د ھەنەك پارچە ھەلبەستان يان ژى قەولان دە ھەرسى ھەنە، د ھەنەكان دە ژى تەنى پەيىشا سەرۋا ھەيە، د ھەنەكان دە پەيىشا بەری سەرۋا، يان پەيىشا پشتى سەرۋا ھەنە و ...ھەندى، ئەم دى نەپا پارچە كا قەولى ئافراندىن دنیا يى ئىنن و ل گورهى ۋە ئەنالىزەكىن:

ئەرد و ئەزمان تونه بۇو

دنىا فەرە بىنە بۇو

ئىنسان و حەيوان ژى تونه بۇو

نېھە دىرا	بەيىشا سەرۋا	بەيىشا بەری سەرۋا	بەيىشا بېشى سەرۋا	بۇو
1	تونه	نېنە	بۇو	
2	بنە	بى	بۇو	
3	تونه	ژى	بۇو	

1. مرتاض، د. محمد: النقد الأدبي القديم في المغرب العربي، دمشق 2000، ص 140.
2. ثائر زين الدين: خلف عربة الشعر، دمشق 2006، ص 101.
3. مزوري، ئازاد عبدولمعزیز: جهلا ددت به درخان و شعر، ب 41.
4. خلوصي، دكتور صفاء: فن التقطيع الشعري والقافية، بغداد 1987، ص 215.
5. روزبهانی، زاهیر: شعریت له دمرهودی شیعر، دهگای ناراس، هولیتر 2008، ب 101.
6. خمزندار، معروف: کیش و قافیه له شیعری کوردیدا، نامه دکتورا، لینینگراد 1962، ب 56.
7. د. صاحب خلیل ابراهیم: الصورة السمعية في الشعر العربي قبل الإسلام، دمشق 2000، ص 202.
8. گردی، عهزمیز: سهرو، لیکولینه و ھیکی شیکاری بهراورده له شیعری کوردیدا، دهگای ناراس، چاپخانه و وزارتی روشنگری، هولیتر 1999، ب 24.
9. یاسری حمسه‌نی: بیناتی ریتمی دشمنا نوویا کوردی دا، دهگه‌ها سپیریز، دهوك، ب 83.
10. یاسری حمسه‌نی: ژیده‌ری بهری، ب 84.
11. ثامر تاهر: نیما یوشیج و عهدوللا گزان، نویکردن‌هه و دابران، نامه کا ماسته‌ری يه، دهگه‌ها سپیریز، چاپ نیکی، چاپخانا حجه‌ی هاشم، هولیتر 2006، ب 44.
12. نهیلی، نعمت الله حامد: شیوازگردی تیواری و پراکتیک، فهکولینه‌که دبیافی هوزانی دا، نامه کا ماسته‌ری يه، دهگه‌ها سپیریز، چاپ نیکی، چاپخانا حجه‌ی هاشم، هولیتر 2007، ب 310.
13. فههمی شوکری عهدوللا: رهگه‌زی نویی شیعری کوردی لای قهدری جان، ب 205.
14. مسعود جه‌میل: وانا کیشناسی، زانکویا دهوك، کولیزا په‌روه‌ری، پشکا زمان و ئەدھبی کوردی، قوانغه دووی، 2007/5/13.
15. احمد امین: موسوعة الادبية، النقد الادبي، ط 4، بيروت، لبنان 1967، ص 87.
16. سوجادی، علاء الدين: ئەدھبی کوردی و لیکولینه‌وه، بهغا 1968، ب 163.
17. فههمی شوکری عهدوللا: رهگه‌زی نویی شیعری کوردی لای قهدری جان، ب 208.
18. فههمی شوکری: ژیده‌ری بهری، ب 208. (ئەف جوړه د کوربیئی ژی دا زور بکار هاتییه و یەکم کەس ئەف قالبه پهیروه کړی؛ بابا تاهری هەمدانییه (گردی، عهزمیز: سهرو، ب 208-209).
19. فههمی شوکری عهدوللا: ژیده‌ری بهری، ب 212.
20. فههمی شوکری عهدوللا: ژیده‌ری بهری، ب 212.
21. خمزندار، معروف: ژیده‌ری بهری، ب 64.

## دەروازیه ک بو چونه ناڭ ڙیان و بەرهەمە

### قەولغان

پیر

رەشى

حەبران



رېزان شفان \ زانکویا دهوك

### پېشگوتنە ک دەرهەق ئۆل و تىكستىن پېرۇزىن ئىزدیان

Di bin vî navê Xendeqî de gelek êl û êşîrêن Êzdiyan hebûne û hene(3). Ev federasiyona êşîrêن Xendeqiyan iro hêjî di nav herêma „Êzdiyêن Xaltiyan(4)“ de pir bi nav û denge. Cîh û warêن vê federasiyona êşîra Xendeqiyan jî, ji ber ciyayê Bûzêrî yên ku li kêleka ava Heskîfê (Hesenkêfê) dest pêdikin, têne heta ber pira Batmanê û ji vir jî dicine ber ava çemê Delan(li milê rastê), gundê Ridwanê, Kêl û Midêwr ê ye.

Di zargotina me Êzdiyan de hêjî tê gotin, heta dema petrol di sala 1934'a de li ciyayê Remanê derneketibû, tevaya Kurd û Êzîdiyan ji van war û ciyayêن di nav herêma Heskîf û Batmanê re digotine "Ciyayê Xendeqiyan."

Belê, dema meriv bala xwe bide ser vî wêne Hesenkêfê, meriv dibîne ku ciyayê Xendeqiyan li hemberî bajêrê Heskîfê dest pêdiken.

Ji xwe di vî ciyayî de vêga hêjî Kela Virreyten(*birênen li ser wêne jî xwanê dibe ku ev ne gelekî ji bajarê Hesenkêfê dûre*)heye.

Li goriya ku zargotina me Xendeqiyan didinê xwanê û dibêjin, raste ku di wextekî de gelek şunwarêن me Êzdiyan li derdora vê Kela Virreyten de jî hebûne.

Vêca, Xwedê bi tenê dizane ka ev kesê bi navê Virreyten(yê ku pêşiyê me çiqas eşîrêن Xendeqiyan e),

dane nivîsandin, gelek „pirtûkên dîrokê“ jî ne rast hatine û têne nivîsandin. Gelek xeleqên şopa dîroka jiyan û baweriya bav-kalêن me Kurd(Êzdî)an ya demêن berê jî ji aliyê biyaniyêن ku hatine cîh-warêن me bi darê zorê dagirkirine, nijadperest û serdestan ve hatine tûnekirin. Lewma niha fersenda min jî zahf tûne ku ez bikarîbim gelekî ji dîroka me ya berê-kevn bînime ber çavan. Lê, ez dixwazim niha bi alîkariya zargotina me(*elbet ev jî ne bê kemasî ne*)ya ku vêga hêjî di singên gelek bav-kalêن me ye zîndî dijîn de, li goriya çend dokument(*bi dîtina min ev jî ne pir kevñin*) li ber çavan hene û zanîna xwe hinekî bahsa nav û dîroka Hesenkêfê ya ku gelek şûnwarêن me Êzdiyan jî li derdora herêma wê hebûn û hêjî hene rawestim. Pêşîn em birênen yek ji dîroknivîsê me Kurdayî navdar, mîr Şerefxanê hukumdarê Bedlîsê (yê sala 1597 an), di pirtûka xwe ye „Şerefname“ yê de bahsa hinek eşîrêن li derdora Heskîfê-Hesenkêfê dike û dibêje: "Sêzde eşiret û qebîleyên giring li navçeya Hesenkêfê hene: Aştî, Mihalbî, Mihranî, Becnewî, Şeqaqî, İsturkî, Kurdlî Mezin, Kurdlî Piçuk, Reşan, Kişkî, Çilkî, Xendeqî, Suhanî û Bidyan (1:191). Bi dîtina min, ji xwe baş xwanê ye ku, hingê di wî wextî de jî gelek ji wan sêzde eşîrêن hatine binavkirin(**İsturkî, Reşan, Cilkî, Xendeqî û Suhanî**) yên Êzdiyan bûn e û hinek ji wan vêga hêjî hene.

### Nimûne:

1 - EM BIRÊNIN LI REWŞA ÊŞÎRA İSTÜRKÎ YAN:  
Vêga jibergirtin(kopî)jeke Mişêwra (ev di wextê xwe de weke kitêbeke Êzdiya ye dînî û pîroz dihat dîtin) me Êzdiyan, ya ku di sala 1278 de bi destnîşana gelek Xasên Êzdiyan hatiye tomarkirin li cem min heye.  
Xudanê vê Mişêwrê hêja Pîr Xetîp dibêje; "eşîra Stûrkiya jî mirîdê me ne....“ (2)  
Wekî dinê jî li goriya agehdariyêن min, gelek merivêن ji vê êşîrê niha hêjî li li Ermenîstan û Gurcîsatânê dijîn hene.

Ez timî dibêjim, ez van gotar-lêkolînan bitenê û li goriya zanîna xwe dinivisînim. Hêvîdarim ev neyê wê mahnê ku ez dixwazim xwe ji wan hêjayan yên ku li ser van babetan nîvisandine û ji we birêzan zanetir bidime xwanê.

Lê ez li goriya zanîna xwe dibêjim, min ne beradayî navê kitêba xwe ya yekemîn daniye „Hebûn Tûnabûna Ézdiyan tev Romanên Zindîne“(1) û hêjî di lêkolînen xwe de dibêjim „Ézdiyatî haveynê mirovatiya mezopotamiya ye û bi taybetî ji xizna nasnama gelê Kurd e(2) û Em kurd tev mina sêvên ji darekê ne (3)“.

### **3- EM BIRÊNÊN LI REWSA ÊŞÎRA „ÇILKÎ (çêlkî-k.t.)Û BECNEWÎ“.**

Dîroknivîsê me Kurdayî navdar, mîr Şerefşanê hukumdarê Bedlîsê (yê sala 1597 an), di pirtûka xwe ye „Şerefname“ yê de bahsa hinek eşîrên li derdora Heskîfê-Hesenkêfê dike û dibêje: "Sêzde eşiret û qebîleyên giring li navçeya Hesenkêfê hene: Aştî, Mihalbî, Mihranî, **Becnewî**, Şeqaqî, Îsturkî, Kurdlî Mezin, Kurdlî Piçuk, **Reşan**, Kışkî, Çilkî, Xendeqî, **Suhanî** û Bidyan (4:191).

**Seydayê Cîgerxwîn jî li ser nasandina Bacinê weha dibêje:**

„Di çaxê Mîr Şerefê Cizîrî de dijminahî kete navbera **Mîr Huseynê Bacinî** û Mîr Şeref û Melik Xelîl, bavê mîr Huseyn, mîr Mihemed û diwazde kurên wî kuştin..... Çawa Qizilbaş ketin Kurdistanê, **Becnewî** bûne hevalbendên wan û di keleha Heskîfê de asê bûn. Çawa ji vir tê xuyakirin, **hindama Torê** didestê **Bacinî(Becnew)yan** de bû.... Ewêñ, ko bi serpêhatiyêñ Becnewîyan agadarin dibêjin: Bext û Becin û bacin birayên hev bûn û di Cizîra Bota de bûn(Raste ev gotinêñ Şerefşan en.Birênen li çavk.4 rûpel:196 k.t.). Lê li hev nekirin û **Becin ji Cizîrê** derket û

kengî di vê newal û geliyê çiyayê Xendeqîyan de hukumdarî kiriye ?

Tê bîramin, me Xendeqiyêñ li gundê Şîmzê diman heta wan salêñ ku hêja pirra nû(ya vêga) temam nekiribun, timî di dawiya demsala havînê de zad-dexilê( ceh, nok, genim, nîsk û hwd.) li ser pişta ker û hespan dikir û dibr li Heskîfê difirot. Ji xwe tenê di vê demsalê de carnan hiza ava çemê Hesenkêfê kêm dibû û meriv karîbû hingê peya ajnî li ser pişta hesp-keran derbasî nava bajarê Heskîfê bive. Hinga hêza avê gelek buna, kelekvanan bi kelekan meriv derbasî wiyalî avê dikirin...

### **Navêñ hinek gundêñ ku di wextekî de Ézdiyên Xendeqî lê diman ev in:**

Baherziq Dêrikê Memika Pêşîm. Sîxura  
Barisil Feqîran(Pîrê eynîka) Mezirka Şahsim  
Basorkê Gêdûk Kaşaxî Mirdêsî Şîhhê  
Bazbût Girê Reş Mizareşê Şêkestekê  
Bazîwan Keverzo (Êz. Fil.) Qulibdor Şîmzê  
Bêdalê Korik (Êz. Fil.) Sîlexer Zercil (Êz.Fil.)  
Çinêriyan Malê Biniyê Sinê(Bakuftê) Zêwa Mîran  
(Ziyaretbû û Feqîr tê de bûn)

Ji bo ev navêñ gundêñ Ézîdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, min lewma navêñ gundan yên bi Tirkî ne nîvisandiye.(3)Em dizanin, niha jî di destêñ Ezîdiyan de Tapo (qoçan) yên gelek gundan hene û herkes jî dizane ev êrdan erdên kê bûne. Lê ji ber ku hemû navêñ wan di kütukan de hatine guhastin, êdî Ézîdi hew karin di rêya qanunan de dawa milk û talanêñ xwe bikin.

Xwandevanêñ hêja !

(birêne li çav.:3-4 k.t) **û Boxtîyan** jî tivêk(tifaq k.t) bi vî ra danîne...”(6:339)

“ Di sala 1401 da Têmûr ferman dike ku duza Finîkê hilşîne. Dema eva duza hatîye kavil kirinê, îdî binamala mezin jî ji Finîkê hatine Cizîr ê ...”(6:342)

Şerefxan jî dibêje, “ Nahiya Finikê aîdê van herçar eşîretên kudan e: **Becnewî**, Şeqaqî, Mîran û Goyî.” (5 :188)

Kesêن li ser vî babetî hêjî ku şik didil û mêjuyêن wan de hene, hêvîdarim hûn karibin li kitêba seydayê Cîgerxwîn(rûpel:193-200)û li tevaya kitêba kekê Ebdullah Varlî(rûp.:60-102 û bi taybetî jî li wan çavkanîyêن ku di rûpel:73 an de hatine kifşkirin) birênen. Ü dema nêrîneke we ye dinê hebe, ji kerema xwe re me jî agehdarbikin.

Bi dîtina min, ev gotin û nêrîna di kitêba seydayê Cîgerxwîn û ya rêzdar Ebdullah Varlî de gelekî balkêşin. Ez dixwazim li virê li bibêjime, rêzdar kekê Ebdullah Varlî gelek spas ji bo we û van lêkolînên we yen balkêş. Bila rahma Xwedê li seydayê Cîgerxwîn be û ez wî bi hurmet bibîrtînim.

Vêca ez li virê cardinê bangî çiqas pispor û dîrokzanêن me Kurdan dikim û lavedikim ku hûn jî dîrok û giringiya van gotinêن navêñ şûnwar, êl û êşîrên me ye kevn, ji me xwandevanan re şîrove bikin.

#### DI VÊ NAVÊ RE WERIN EM BIRÊNEN, KA EW NETEW ANJÎ KESÊN KU GOTINE Û HÊJÎ DIBÊJIN „KURD JI CINANE,, KÎNE?

Ji xwe seydayê Cîgerxwîn bersiva vê pirsê daye û egotîye, “Ewê, ko dibêjin Kurd ji cinane agehdariyêن xwe bi çewtî guhaztine.”(5:198-199) .

Her weha dibînim, rêzdar Ebdullah Varlî jî li ser vî babetî lêkolîn kiriye û dibêje, “Ewan komalne Samîne ku ji wan re Ereb dibêjin; Kurd komelekî ji cinanîn.... Evan Kurdê ku

**hate Heskîfê.Eyûbîyan Heskîfe kele ij Becnewîyan sitandine.**“(Berdewam di çavk.5 rûpel:198-199 de ye).

Seydayê Cîgerxwîn berdewam dike û dibêje: „Becin(Bacin), eşîreke Kurde, li Torê hetta îro jî rûniştîne û meriv ji wan re dibêjin Êzîdiyêن Bacinê. Bacin bi xwe şikeftin û wêran bajarek hîna heye, ko jêre dibêjin **Becnexwêr**, di nav êşîra Hevrika de ye û bê gumane, ku Becnewêr, bajarê Becna, Becnewiya ye û **Mihemed Emîn Zekî Beg, wezîrê navdar dibêje, Becnewî, Becnawe,Basinawe.** Lê, bi rastî BACINE. Ji ber ku gundêن bi „ba“ gelek di hindama Heskîfê de peyda dîbin. Bagas, Balan, Batûş, Basyat, Bacin.”(5:rûpel:198-199)

Kekê Ebdullah Varlî jî dibêje, „Pur dîrokzanan gotine; eva navê **Becinan** di para da li bal dîrokzanêن Ereban bûye **Beşîna-Beşnewîyan**, îro li bal kurdne dumilî, peyva c-ç ya li bal Kurdne Behdînî, ş-j, di şûna hev da têne xebatê. Wekî, Çûn=Şûn tê gotine....”(berdewam di 6:74-76).

“ Qirîna misilmanan di van gavan (sala 631 k.t) da xurî di Welatê kurdne Cunukî da buye. Di wê gavê da Ereban ji wan ra **Bacinan** di gotin. Paşê eva nava bi hinek guhurandinan bûye (**Bejnewî-Beşnewî- Becnewî**)...” (6:88-89).

“**Beşnewîyan** di sala 983 da fermanrewaniya bajarê bi navê Finîk-Finik-Fafa-Îlfafan bûne. Evan Beşnewîyan di jîna Kurdne bi nav Buxtî da şûneke mezin hildane...”(6:337)

“Gava Emîr Ebûnasir Hesen di sala 1131 de buye serokê Finîkê, îdî di binê ala xwe de xebatê dike, destêñ hemîş kesen ji fermana Welat bide birîne û lingêñ wan pêpeskirina welat bide berdan. Evî serokî di cara yekem da hemî **Beşnewî** dîbinê ala xwe da daye civandin, **Xeldî**

Kesên ku di vê dema me de bi nasandina Êzdiyatî ve elaqe bûne, ew jî xizmetkarên li ber Mala Şêx Adî yên di rêza bilind dene nasdikin. Bê guman yek ji wan ruhaniyan jê jî Feqîr Hecî Şemo ye.

**Feqîr Hecî Şemo**, eva cil û şes salî li **LALIŞÊ** li ber mala Şêx Adî xizmetê dike. Ewî jî li ser vî babetê ku cin vêga hêjî li Lalişê hene weha dibêje:

“Bila baweriya we bê, carekê ez bi bavê xwe re li nav mala Şêx Adî de bûm û min bi guhê xwe bihîst ku cin dihatin li mala Şêx Adî ziyaret dibun.

Hinga ez û bavê xwe çune ciyê ku cin lê disekinin, bavê min bi dengê xwe bankire cina û got:

“*Ya seri cin,*

*Ya kewkebî cin,*

*Ya cinî cin,*

*Ya cin talî cin,*

*Ya hûrî cin,*

*Ya turî cin,*

Ya tûmarî cin..... “û bi Xwedê min bihîst li derdora me bu çîw çîwa wan. Bavê min gote min:” Deng wan tê te Hecî?”

- Min go, erê welle bavo, va dengê wan xweş tê min jî.”(7)

**Li gorî urf û edatêni di nava civaka me Êzdiyan de, cinikêni ku meriv şiklê wan nabîne hêjî li gelek deveran hene.**

Lewma jî zargotina me dibêje, ji bo ku jin di ber çêbûna zarokê de bi tirsa wan cinikan nekeve anjî cinik neyên rihê zaroka wê ji xwe re nebin ne guhêzin, surra cinika negîje dê û zarokê, pîrikê werisek li der dora ciyê(livîna) jina ku zarok jê re çêdbû dipêça, devgur û dasek(kêrek whd.) jî heta sê rojan li ber serê wê datanî. Carnan gava astengî di ber çêbûna zarokê de derdiketin, pîrikê digot:“sileh(çektiving)ekê berdin, bila cin ji vê derê herin“.

Ereban ji wan ra cin gotine ji Nînova yê heyâ zerya sipî di quntara çîyan da dijîtin...“(6:73)

„ Cuhûyan ji bona Kurdan re çê kirine ne ji bona rastiyê ye, ji hêrsa bi nav û nûçikan li pey Kurdan ketine. Cuhûyan navê Kurdan di wan gavan da *Mad, Gûdî, Sirtî, Xeldî, Gûrattîtî u Cingatî* zanî bûne û di purtûkê xweyê pîroz da jî nivîsîne. Şixa Cuhûyan eva doza hanê heyâ denekî pêşva birine û paşê Ereban ji wan sitandine, îdî ji xwe ra xemilandine...“( berdewam di 6:74-76).

**Ez jî weke ku di lêkolînan de xwanê dibe û dibêjim, me Kurd/Êzdî an tûcarî ne gotiye,“em ji cinikan e“**

Ez jî timî dibêjim û gelek ji we xwandevan jî dizanin ku di Kurdîstanê de jiyana me Êzdiyan, ji jiyana gel û olên dinê pir cûda bû. Piraniya dîroknaşen di nava desthilhildariya dagirkerên welatê me de rewş û dîroka me bi hemda xwe nerast û ne objektiv dane xwanê. Neheqî û bêbextiya gelek dîroknaşan ewe ku ewan di berhem, dokument û şîrovêx we de li goriya berjivendî û nêrînên hukumdarان bahsa dîrok û kevneşopêن me Êzdiyan kirine. Ji xwe ji ber van çewtîtiyêن dîrokê ye hêjî „qanûnên“ dewlatê dagirker û baweriyyêน nijadperestan bi hevre nahêlin şopa netew û çande(kevneşopêن) me Kurden resen bêne xwedîkirin.

Bi dîtina min lewma seydayê Cîgerxwîn jî gotiye,“ Ewê, ko dibêjin Kurd ji **cinane** agehdariyêن xwe bi çewtî guhaztine.“(5:198-199)

Em Êzdî ïnkar nakin û em vêga hêjî weke bapîrên xwe dibêjin, cinik li gelek deveran hene û em ji keremet û surrên cinikan bawerdikin.

Keremkin ezê niha çend nêrînan ji nava zargotina me Êzdiyan yen hêjî li ser vî babetî zindî têne gotin, pêşkêşî we hêjayan bikim.

zarokêne bitenê herine van deveran. Cinik gelekî ji hesin, kuçik(se)an û agir ditirsin.

Ji xeynî van ciyê cinikan jî gelek Zîyaretên pîroz li derdora Bacinê hene

1. Ziyareta Mîravê,
2. Ziyareta Şêra Laliş
3. Ziyareta Tayêk
4. Ziyareta Şêx Ahmed
5. û hwd.

Weke ez dibînim, di nava zargotina gundiyên Bacinê û tevaya Ezdiyan de gelek serpêkhatî û buyer li ser hebûna cîh û bayê/surra cinikan hene û ez nikarim tevan li virê de bidime xwanê.

Bi dîtina min, ji ber ku Ezdiyan û bi taybetî jî Ezdiyên li devera Torê timî di nav zargotina xwe ye berê de jî weha biserbilindî bahsa hebûna gelek ciyên cinikan yên di nav û herêma Bacinê de hebûne kirine û gelek serpêkhatiyên li ber bayê Cinikan jiyane û belakirine, lewma dujminê dînê Kurdan yê resen ku Ezdiyatiye û dagirkirêne welatê me gotinê „**Kurd ji cinane**,“

Wekî dinê jî, dema ez li goriya zimanzanîna xwe vê gotina Bacin'ê şîrove bikim, ezê bêjim **Bacin : Devera cin û bayê(surra-tirsa) cina lê heyî re tê gotin**.

*Li virê jî dîsa ji pispor û zimanzanên Kurdan lavedikim ku hûn giringiya van gelek gotinêne weha xwuri Kurdi yên ku hêjî di nava zargotina me Ezdiyan de têne bikaranîn, ji me xwandevanan re şîrove bikin !*

CIH U WAREN « **ÇILKÎ** » (ÇÊLKÎ-K.T.)Û  
« **BECNEWÎ** »YAN.

**Li goriya zargotina me, ÇILKÎ (anjî çêlkî-k.t.) ji du heremên Ezîdiyên Torê re tê gotin:**

Dîsa ji ber tirsa cinikan, diya zarokê heta ku çilroja zarokê ne diqedîya, gava avek jî vexwara gereke ewê derzî anjî şujinek bixista nav tasa ava xwe. Wexta ku di çilêxanê zarokê de, dayîkeke dinê bi welidiya, gereke dayikê zarokan derziyên xwe yên durûnê bi hevûdinê biguhastina. Li gorî baweriya civakê, gava zarokeke kêm aqilbu, dereng xeberbida û birêve biçuya digotin: “**Cinikan ev zarok guhastiye**“

- Lewma jî zarok dibirin li ser rê datanî ne pêşıya garana dewara.
- Zarok dibirin li serê heft riya dixistine nava sîtilekê.
- Zarok dixistine nava kurtanê karê de radizandin.
- hwd.

Dûre zarokê xeberdida anjî birêve diçu.

**Di zargotina gundiyên Bacinê de jî xwanê dibe ku di nava gundê Bacinê de gelek ciyê cinikan hebûn û hêjî li van deveran hene :**

1. Xirbê Hûrîka
2. Baxîtan
3. Çahla Şehîn
4. Çahla Kund
5. Şikefta Nahûsa
6. Şêkefta Mala Şêxo
7. û whd.

Hemû jin û mîrên Bacinî vêga hêjî dibêjin, bav û bapîrên me timî ji mere qaldikirin û digotin, me gelek caran cin li nava wan xirbê xirabe(kavîlin) ku li raserî Bacinê de dîtine. Ji xwe dema em jî li der û dora van ciyên me bahskiriye biggeriyana û ku tiştekî ji hesin/demir çêkirî anjî yê agir jê diçû-ronayî bida bi me re tûnebûna, cinik derdiketin ser ruyê erdê xwe şanî me didan. Ji ber vê tirsa cinikan wexta em diçûne nava van deverên em binavdikin, me eşiyayê ku cinik ji wan ditirsiyan bixwere dibirin û me ne dihişt

Di zargotina Baciniyan de tê gotin, kes nizane ka rûnnîşvanên Bacinê yên kevn ku bavikê Dermoka, Ozmanan û Zêdê yan e kengî ketine gundê Bacinê avakirine. Lê, xweya ye ku sê birayê binavê Heyno, Botu û Musur ji ber kuştina mîrekî neçar mane ji herêma Serhedê derkevin û hatine xwe avîtine ber bextê mîrê Mihelmiya yê ku hingê li hêrêma Torê bi nav û dengbûye. Bi destûra Mîr ev her sê biran jî di gundê Bacinê de bicîhbûne.

Ji xeynî van jî Nasirkî, Bahcolî, Mala Teyêr, Dekşorî, Zeynikî (Zeyna), Şeroka, Çomerka (wêga kesên Îzîdi ne mane), Şivqetî, Simoka, Salîhkan, Hewêrkî (eşîreke Kurdi ye ne tenê Îzîdi ne her wisa Xaçparêz û Musilman jî hene), Botî û w.d.

#### Hinek navêngundêni Îzdiyan ku li Torê hebûn evin:

Bacin	Kefnas	Taqâ	Sifelî
Baqîk	Kîwex	Xeraba	Badib
Bizê	Koçan	Xirbê Bênenêrê	Bizênkâ
Cefan	Mizîzexê	Xirbê Hûrîka	Bizêziyê
Cixsan	Nemîrdan	Xirbê Reş	Qûbanê
Dêrwan	Qûbika	Xirbê Xelo	Hevindeka
Kasiya	Qudbê	Yucan	Gozikê

Ji bo ev navêngundêni Îzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, min navêngundêni yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

#### ÊZDIYEN ÇOLÎ (Deşta Qulika- anji Îzdiyen li qelaçê Dasika).

Ev Îzdiyen Çolî li derûdora Cizîrê, Silopî û heta van demêndawî jî li derûdora Nûsaybînê diman.

1- Îzdiyen Torê/Çêlkî.

2-Îzdiyen Çolî (Deşta Qûlîka-anjî Ezîdiyen Qelaçê Dasika).

#### ÊZİDIYÊN LI TORÊ:

Êzîdiyen vê heremê li derûdora Mêrdînê, li Midyadê û Kercewsê diman.

#### Warêni Îzîdiyen li Torê:

Êzîdiyen li Torê, di navbera van gundan de dijîyan: Gava ku mirov ji gundê Bacinê derkeve ber bi rojhilat ve biçe gundê Quzrê, Xêrbê Pêbinêrê, Bizê, Badibê, Kîwexê û ji vir jî cardinê were Bacinê.

#### Cîh û warê Bacinê

Di zargotina gundiyan Bacinê de tê gotin ku „Bacin gundek ji gundêni Torê ye û li basşûrojhilatê bajarê Midyadê dikeve. Ev herdo cih 6-7 km ji hev dûr in.”(8)

“Vêga hêjî li raserî gundê Bacinê kavil û xirbeyên Kelekê hene û seydayê Cîgerxwîn ji van kavila re gotiye:“ Becnexwêr”. Me didît gelek caran kesên ku li zêr û tiştên kevnar geriyan, dihatin binê van kavilên Kelê dikolan. Lê, kes ji me Baciniyan nizanen bê ew diz kîbûne?. Xwedê tenê pêdizane, bê ka kî di van kavilan û Keleyê de hukumdarî kiriye?”(8)

#### Gundêni cîranê Bacinê ev in:

“Nihil (rojava - 3 km), Barmus (başûr - 3 km), Koçan (rojhilat- 5km), Mizîzex (bakurrojhilat - 6 km) û Kerşaf (bakurrojava -7 km)”(8).

#### Navênginek bavikêni Îzdiyan yên ku li gundê Bacinê diman û niha jî hene ev in:

## **4 – EM BIRÊNÊN LI REWŞA ÊZDIYÊN JI ËŞÎRA „REŞAN“ (REŞÎ)**

Weke ku min di kitêba xwe yekemîn(1:37) de daye xwanê û em di gelek kitêbên dîrokî da jî dibînin, ev navê „Reşan“(reşî) li gelek heremên Kurdistanê û li nava gelek welatên cînarên Kurdan de xwanê dike.

Li goriya agehdariyêñ min binemalêñ ji Reşan(Reşî, Reşa, Rişan, Risî, Reşıya, Reşikî, Rişvan,Reşû û hwd.) li nav herêma êşîra Xendeqîyan, Anqosîyan, Dawûdiyan(li der dora çemê Reşa), Mastekiyan, Deniyan, Serhedê, Êzdiyêñ li nav herêma Kurdîstanazad û Kurdêñ Anatoliyan Navîn de jiyane. Gelek jê wan vêga hêjî di nava van herêm û êşîrêñ min binavkirene de li Ermenîstan, Gurcîstan, Îraqa Federal (li gorî gotina Feqîr Hecî Şemo, „piraniya binemalêñ feqîrêñ Êzdiyan yen li herêma Kurdistanê de dijîn ji êşîra reşa ne“-7)û li Almaniya yê de weke Êzdi dimînin.

Gelek kesên ji herêma Heskîfê jî dizanin, navê gundek/bajarekî li raserî bajarê Hesenkêfê jê Reşî ye û ev gunda vêga hêjî heye. Tê bîra min, çewa me Şimziya hingê zadê xwe dibir li Heskîfê difirot, wusa jî van gundiyyen Reşıyan berhemêñ xwe yên ji nava rezan(tirrî, mewîj, hejîr, guvîj û hwd.) dianîn linava gundêñ me diforotin anjî bi zad diguhastin.

### **Çavkanî:**

1. Şerefxanê Bedlîsî , ŞEREFNAME (berî çarsed salan di 14.8.1597 de temam kiriye k.t.)-Tarixa Kurdistanê ya kevn- Zîya Avcı, Apec çapa yekema kormancî 1998 Swêd
2. Xudanê vê Mişêwrê hêja Pîr Xetib e û ev di sala 1270 de bi destnîşana gelek Xasêñ Êzdiyan hatiye tomarkirin. Orginalê vê niha li cem mamostê thologiya Êzdiyatîyê, hêja Pîr Xidir Sileyman serokê Centerê Bingehê LALIS Dihokê heye.
3. Kemal Tolan, Kitêba “Hebûn û Tûnebûna Êzdiyan Tev Romanêñ Zindî ne”- Sala 2000, ji Weşanêñ DENGÊ Êzdiyan.Rûpel:36-68

## **Warêñ Êzdiyêñ li Çolê**

Gava mirov li ser sînorê Tirk û Suriyê; ji gundê Hacîlo derkeve here Şamaxê, ji vir here Gelyê Pîra (Mezrê), ji vir here Rebena Bagilş (Kîwexê), ji vir here Bahminê, ji vir here Ewşê hete Badîbê, ji vir jî here Bîrgurya û Bagokê, here Qesra Belek û cardin vegere were Hacîlo. Ev hereman warêñ Êzdiyêñ Qulika bûn.

### **Navêñ hinek êşîrêñ Êzdiyêñ Qûlikan ku hêjî hene wehan e:**

Şêxê Berhokê, Bahcolî, Kelikan (Behminmî, Êvşî, Mihokî, Kîwexî), Dasikan (Berê li bîstûşes gundan hebûn û pîrê wan ji binemala Pîr Eli ye), Hewêrî (eşîreke Kurdi ye, ne tenê Êzîdi her wisa Xaçparêz û Musilman jî hene), Seydokî û.w.d.

### **Navêñ hinek gundêñ Êzîdiyêñ ku li herêma Çoliyan hebûn evin:**

Ahcîlo Gelyê Kelê Mitwana Jor  
ŞahrataBamil GelyêPîra Mitwana Xwar  
ŞekrînBaqrûdan Gelyê Sora Pelaşû Şemqî  
Bazar Hebnat Pûlme Şûşaniya (Ewta) jorîn  
Berhok Kemîna Qesira Belek  
Şûşaniya (Ewta) xarîn  
Bêzdana Kengelok Qubika Tilê (Ziwing)  
Bîrguriya Kirşê Qulika Xanika Şêxan  
Dîrpû Kunar Sêlwan Xastû  
Efsê Mezrê Sêwilîtik Xîrbê Cinatê  
Êlîn Mezrêya Rebena Spîwaniya Gelî Xîrbê Remê  
Evşê(Avşîn) Mişawil  
Tellê Xîrbik Fisqîn Temeling Zirîqa

Piştî şerê Çildîranê di sala 1514 an de û bi taybetî dema sultan Yavuz Selîm, derbasî Misrê bûye, wî desthilatdariya Şam û Helebê spartîye Îzeddîn bagê Êzidî, yê ku dibe ji neviyên şêx Mend, û wiha Îzeddîn bagê Êzidî seroketiya mîrgeha Killisê kiriye - Hingê herêma Efrînê jî bi ser Killisê ve bû- Wek tev mîrgehêne kurdan ku sultan Selîm soza xweseriye bi wan re dabû.

Ta bi çerxê 17 an jî, hêj desthilatiye herêma çiyayê Kurmênc tev di destê Êzidîyêne herêmê de bû, lê jê û pêve hin bi hin ji dest wan derket, ew jî bi sedema ku berberî û nekokiya xwe bi xweyî di nav wan de balav bû, hem jî ji ber zilm û zora karbîdestên Osmaniyan ku şerê wan dikirin da ku wan bikin misilman.. û wiha gelek ji eşîr û serokeşîrên Êzidîyêne çiyayê Kurmênc ji neçarî bûn misilman wek Mala Evdal li gundê Birca Evdalî û mala Baqûbî li gundê Xezawiyê..

Belê, berî û piştî ku mîrgehêne kurdan bi destê Osmaniyan bêne herifandin, her Osmaniyan xwestîye ku Êzidîyêne çiyayê Kurmênc wek êzidîyêne deverên din bikin misilman. Hem jî Xiristyanan, di rîka gerokên xwe re xwestine wan bikin Xiristyan. Û wiha di nav salan re 73 fermanên qirkirinê bi serê gelê Kurd yê Êzidî de hatine, herêma Efrîn jî di nav de. Gelek caran tûşî helandin û koçberiyê bûne û bi dehan ji eşîrên wan, ji neçarî bûne misilman..

Di destpêka çerxê 20 an de, dema ku Kurdistan bi sînorê dewletên dagirker hatiye perçê kirin, hînge mîrê Êzidîxanê, li gor rewşa gelê Kurd yê Êzidî, Êzidîxan kiriye 7 herêm an (Sinceq), ji her herêmekê re Tawûsek(Enzelek), bi nav kiriye, wek simbol ji hebûn û berdewamiya dînê Êzidî re, da ku pêwendî û hevgirtinê gelê kurd yê Êzidî ji hev qut nebin, bi hev re girêdayî bimînin û neyên helandin û bişaftin di nav misilmanan de. Vêca Tawûsek ji wan Tawûsan bi navê (Tawûsê Helebê) ji Êzidîyêne sûriyê re hatiye terxan

## Êzdiyêne li çiyayê kurmênc (EFRÎNÊ)



Konê Reş/ Qamişlo

Kurdên Êzidî yên çiyayê Kurmênc(Efrînê), li rojavayî bajarê Helebê; li deşta Cûmê, quntara çiyayê Kurdaxê û derdora çiyayê Lîlûnê(Seman), bi cî û war dibin û jiyanâ xwe ji sedê salan ve li vê herêmê derbas dîkin. Xuyaye ku piştî herifandina impiratoriya Xalitiyan, Êzidî di welatê Mezopotamyayê de belav bûne, xwe li cihêن asê girtine û wiha jî hin ji wan li çiyayê Kurmênc û deşta Cûmê bicî bûne.

Dîrokzan dibêjin; di destpêka çerxê 13 an de, fermandarên Eyûbiyan pêwendiyêne xweş bi şêx Mendê Êzidê re ava kirine û ew wek Mîrê Mîran li ser tev kurdên herêma Şam û Helebê nas kirine. Di nav wan de kurdên çiyayê Kurmênc bi êzidî û misilmanan ve. Û wiha xweş salên aramîyê di bin desthilatdariya şêx Mend de derbas bûne.

Kevin heye û di rex de kavlê keleha malbata Cinbilat xuya dike.

**Mezargeha Şêx Hemîd:** Dor du km başûr û baxerbî Qestela Elî Cindo ye, di rex de goristana gunde û kin kavlên kevnar hene.

**Mezargeha Şêx Elî:** Di orta gundê Basûfanê deye.

Mezargeha Pîr Cafer: Di rex goristana şêx Henan de ye a ku Dr. Nûrî Dêrsimî têde hatiye vaşartin.

**Mezargeha Ebû Ke'ebê:** Li gundê Ebû Ke'ebê ye, mezargehek giringe ji Êzidîyan re, lê mixabin piştî ku gund vala bûye bê guhdan maye.

**Mezargeha şêx Menan:** Li ser bilind cihekî ye di ser Kefer Cenê re, qurbanan lê serjêdikin û heviyên xwe ji Yezdan dixwazin..

**Mezargeha şêx Qeseb:** Li gundê Kilûtê ye, ser çiyayê Şerewa an(Lêlûn) e. Wek şikeftekê ye, av jê diniqute.. Bêguman rola van mezargehên pîroz di mayîn, parastin û hebûna dînê Êzidîyan de li herêma Kurdayê pir mezin e.

Erê, roja îro li herêma Efrînê, Kurdên misilman û kurdên Êzidî bi hev re dijîn, jiyanekê wek hevî, bi xweşî û nexweşiyê re, bi hev re derbas dikin.

Navê Eşîrên wan evin: *Xalîti, Anqosî, Dawidî, Keçanî, Şerqîyan(Qûpanî), Reşikan, Denadiyan, Piromerî(Şerewa), Pûrî(Hekarî), Xast(Şerqî), Badînanî, (Nas reddîn)Şikakî, Dumîlî.*

#### Gundêن wan:

##### Ji gundêن Êzidîyan li navçeya Şikakan:

- 1 - Qestela Elî Cindo: Dor 120 mal lê mane.
- 2 – Baflûnê: Dor 70 mal heye.) Ev herdû gund tev Êzidî ne
- 3 – Qitmê: 70 mal lê mane.
- 4 – Sînka: nêzîkî navçeya Şera ye, dor 35 mal lê mane.
- 5 – Elaqîn: Dor 25 malan lê mane.
- 6 – Sîceraz: 3 mal lê mane.

kirin. Her sal, di mehêن biharî û payîzê de Qewal û koçek, wî Tawûsî li herêmên Êzidîyan yên ku li Sûriyê ne digeraînin wek: Efrêن, Tirbespî, Hesekê, Amûdê û Serê Kaniyê. Û ji wê hingê ve û ta roja îro Êzidî li herêma Efrînê û deşta Cûmê, li Hesekê, Amûdê, Tirbespiyê û Serê Kaniyê xwe parastine û dijîn.

Tevî ku Êzidîyen derdora Heleb û Efrînê dûrî (Lalişa Nûranî), navenda rûhanî a Êzidîyetiyê ketine, lê her wan zimanê Kurdi yê ola xwe parastine. Ew jî bi saya Şêx, pîr, Feqrîr, Mirîd, Birayê Axretê û Qewalbêjan.. Hem jî bi saya mezargehên pîroz yen ku di nav kurdên Efrîne de belavin wek:

**Mezargeha Şêx Berekat:** Ji mezargehên Êzidîyan yên bingehîne li başûrî Xizêwiyê ye, ser çiyayê şêx Berekat e, başûrî Efrînê ye bi dor 30 km.

**Mezargeha Çêlxane:** Şikefteke di qontara çiyayê lêlûne de hatiye kolan, başûrî gundê Qîbarê ye, bi dor 2 km an û bi dor 5 km an başûrî Efrînê ye.

**Mezargeha Melek Adî:** Dor 300 M dûrî Mezargeha Çêlxane ye, nêzîkî kavlên Eşqîbar a kevin e, û di rex de goristana herî kevnar a êzidîyan de yee.

**Birca Cindi(Warê Xerqê):** An Birca Pêbaweran, di rex goristana Qîbarê a kevin de ye. Dibêjin bi keviran û xweliya bi şêr strayî hatibû ava kirin, lê mixabin niha wêran e, bûye kavîl.

**Mezargeha Hicrika Şêx Hisêن:** Başûrî gundê Qîbarê ye, li ser rêka goristanê ye.

**Mezargeha Şêx Rikab:** Li gundê Şêx Eldêr an li Şadêrê ye, ji mezargehên bingehîn e, di rex de goristanek êzidîyan a kevnare heye, êzidîyen van gundan miriyên xwe lê vedişatin Basofanê, Kefer Zeytê, Xezawiyê Îskan ..

**Mezargeha Şêx Seydî:** Di nava gundê Feqîra de ye.

**Mezargeha Parse Xatûn:** Li ser kûpê çiyayê Parsê ye, di rex gundê Qestela Elî Cindo de, di baxerb de goristanek

Eger mirov xweşik di navê gundan, eşîran û adetûteqalîdên wan de biponije, wê bibîne ku pirraniya xelkên Efrînê berê Êzidî bûn..

Êzidîyên Efrînê gelek cejnan li hev pîroz dikan; wek: Cejna Rojiyê: Ev cejin ji bi du beşa ye; Rojiya cilê Zivistanê ku di keve cilê cil de û rojiya cilê havînê ku di keve cilê havînê de. Cejna Sersalê: Ev cejin, dikeve çarşema pêşîn de ji meha Nisanê a şerqî, hem jî jêre dibêjin Çarşema Sor. Cejna Xidir Îlyas: Hem jî bi navê (Pêxwînê) an Bêxwînê, An cejna Miradan, tê naskirin. Ev cejin mîna cejna Valantain e an cejna Evînê ye, dikeve roja îna pêşîn ji meha sibatê a şerqî de. Rêûresmên vê cejnê yên taybetî hene; divê xwarinek ji heft bizrên nebatan yên wek: Genim, nok, fûl, fisteq, behîv, garis, kuncîbê çêkirin, piştî ku tev bi hev re bêne hûr kirin, têr xwê dikan û êvara roja îna pêşîn ji sibatê dixwin û li ser radizên û her yek daxwazekê dixe dilê xwe de.. Dibêjin Xwedê daxwaza wan pêk tîne.. Cejna wan a Biçûk: Berê cejna biçûk a misilmana ye bi rojekê. Lê Cejna wan a Qurbanê: Bi eynî cejna Misilmanan a qurbanê re ye.

Ji Şêx, Axa û maqûlên Êzidîyan di destpêka çerxê 20 an de, mirov dikare van navan bibêje: Dewrêş axa Şemo, wek serokê eşîrên Êzidîyên Çiyayê Kurdaxê dihat nas kirin û endamek bû di komela Xoybûnê de. Piştî kuştina wî di sala 1931 ê de, kurê wî Cemîl Axa û Apê wî Omer Axa ji mala Şemo li gundê Qîbarê, serokatiya Êzidîyên Kurdaxê kirin. Weha jî mala Izeddînê Şeref li Şadêrê, ku pirê wan niha bûne misilman wek axa û maqşlên Êzidîyan dihatin nas kirin... Hem jî şêx Elî kurê şêx Berekat, wek şêx û serokê eşîra Denan dihat nas kirin, di sala 1994 an de wefat kiriye.

Belê roja iro şêx Hisên kurê şêx Hesen ê Birîmo /1934/, li gundê Xezawiyê wek serok û şêzekî navdar e di nav tev

### Ji gundêñ Êzidîyan navçeya Cûmê:

- 1 - Feqîra: nêzîkî Qîbarê û Efrînê ye dor 100 mal hene, tev êzidî ne.
- 2 – Xezawiyê: Dor 60 malî lê mane.Mala şêx Hisên Birîmo lê ye.
- 3 - Eşqîbar an Qîbarê: dor 70 malî lê mane .
- 4 - Turindê: Nêzîkî Efrînê ye, dor 20 malan lê mane.
- 5 - Şadêrê: nêzîkî Basûtê ye, dor 10 malan lê mane.
- 6 – Çeqela Cûmê: Dor 10 malan lê mane.
- 7 – Îska: dor 10 malan lê heye.
- 8 - Eyndarê: Ew jî nêzîkî Efrînê ye, dor 10 malan lê heye.
- 9 – Aşka Şerqî: dor 6 malan lê mane.
- 10 – Keferzîtê: Dor 40 malan lê mane.
- 11 – Qûçûmo: du mal lê mane.

### Ji gundêñ Êzidîyan li Sêrewa Evin:

- 1 – Basûfanê: 130 mal lê hene tev Êzidî ne.
- 2 – Kîmarê: 10 mal lê mane.Mixabin ku roja iro dîbin xaçparêz.. Kavilên herî kevnar li vî gundî hene, ji wan kavilan kevanekî mezin li ser dergehekî maye, weneyê du teyrêñ Tawûs li ser xuya ne...
- 3 – Gundê Mezin: Bi tenê 5 malên Êzidîyan lê mane.
- 4 – Be‘iyê: Dor 10 malan lê mane.

Xelkên van gundan dor 1000 mal hene, wek wan jî li Efrîn, Heleb û bajarê din hene. Mirov dikare bibêje ku hejmara Êzidîyên li herêma Efrînê û yên ku li bajarê Helebê û Efrînê akincî bûne dor 25,000 nefer hene.

Belê berî çerxê 20 an hejmara Êzidîyan ji hejmara wan ya iro bêtir bû. Wê hingê li navçeya Cûmê 30 gundêñ wan hebûn, li navçeya Şikaka 20 gund hebûn, li navçeya Sêrewa/Çiyayê Lîlûnê 18 gund hebûn..

Evdo li gundê Kîmarê, Dewrêşê Nasirê Şemo li gundê Qîbarê û wiha gelek kesên din. Li Helebê, taxa Şêx Meqsûd jî, ez çav bi gelek Îzidîyan ketim, ji wan kalemêrek bi nave Hesenê Nebo, temenê wî dor 95 salî, jêre digotin HECÎ, xuyaye ku ji berî çend salan ve, tewafa Lalişa Nûranî kiriye û bûye Hecî..

- Dr. Zerdeş, Bavê Leheng: Kovara Laliş 8/1997, Gundê Ezidîyan li devera Efrîn/Sûriye.
  - Roger Lescot: Kovara Elhîwar 21/1998, Eşair Cebel Elekrad/ Kurdax, mintîqet Efrîn, wergerandina B. Êva.
  - Kemal Tolan: Kovara Laliş 20/2003. Îzidîyan li Kurdistana Rojava.
  - Konê Reş: Cimiyet Xoybûn 1927 We Weqayî Sewret Ararat 1930, Hewlêr 2000.
- \* - Roja iro em dibêjin Herêma Efrînê, lê berê bi navê Çiyayê Kurmênc dihat naskirin. Di heyamê Osmaniyan de, navê wê guhertin û kirin Kurdax, piştî ku Osmanî derketin û heyam bû erebî, Ereban navê wê kirin Cebel Elekrad, vê paşiyê li vê yekê jî nesekinîn, niha di nivîsên xwe de dibêjin Çiyayê Helebê.

Îzidîyen Sûriyê de. Di roja 11/02/2009 an de çûm mala wî gundê Xezawiyê û min suhbetek dirêj pêre derbas kir.. Wî ji min re got ku hejmara me Îzidîyen Sûriyê dor 50,000 nefer heye, ji wan 25,000 li herêma Efrîn û Helebê ne û 25,000 li Cizîrê ne. Û ji şêxên din yên ku iro di nav Îzidîyen Efrînê de hene: Şêx Omer ê Şêxo Bekir e, bi temenê xwe xort e, li gundê Qestela Cindo dimîne. Hem ji Şêx Mihemed ê Xelîlê Kalo ye/1938, li gundê Birca Evdalî dimîne û şêx Nûrî li Heleb, taxa şêx Meqsûd dimîne, û ew biraziyê şêx Hisêن ê Birîmo ye.

Ola Îzidîyan ji olên herî kevnar e di dînyayê de, olek çiyayî ye, li ser bingehê bûyerên xweristî hatiye ava kirin. Kok û rehêن xwe ji bîr û baweriyên xelkên herî kevnar distîne wek Hindîyan, Hindoewropiyan û xelkên mezopotamiya. Hem jî gelek bîr û baweriyên şaristaniyêن kevin wek Someriyan, Babiliyan Aşûriyan û Mîdiyan bi xwe ve girtiye û hilaniye... Erê ola kurdêن Îzidî oleke çiyayî ye, oleke şuristî ye, Oleke aşitîxwazane ye.

#### **Jêder û perawîzêن ku min sûde ji wan girtive:**

- Di rojêن 10-11-12-02/2009an de, bi gereke taybet, bo danheva pêzanînan li dor gelê Kurd yên ku bi ola xwe Îzidî ne, ez çûme bajarê Helebê, Efrînê û Çiyayê Kurmênc an Kurdaxê(Deşta Cûmê, Navçeya Şikaka û çiyayê Lîlûnê(Şêrewa). Di vê gerê de ez li gelek gundêن Îzidîyan geriyam, çav bi gelek kalemêr û zanayêن wan ketim û min gelek pirs ji wan kirin. Ji wan kesên ku min ew dîtin û pirs ji wan kirin evbûn: Şêx Hisêن kurê şêx Hesen ê Birîmo li gundê Xezawiyê, Şêx Omer ê Şêxo Bekir li gundê Qestela Cindo, Mehmûd keleş li gundê Qîbarê(Elhewa), Fûad Hiso û biraziyê wî Heval Hiso li Gundê Qestelê, Bavê

kurdan,pirê caran, wateyeke tersî wateya rexneya zanistî heye. Çima?.

Rexne li ba me, pirê caran, hêriş e, sûclêgirtin e, nepejirandin e, tunekirina ray û nerînên cida ye. Loma jî gava mirovê kurd evê bêjeyê dibihîse, çavên wî yekser sor dibin, madê wî tirş dibe, sîngê wî hiltê û datê, derdora xwe dipelîne, ji helekê de, mertalan ji xwe re peyda dike, da xwe di paş de biparêze. Ji hêla din de jî tîfran û gotinêñ erzan dicivîne, da bi ser kesêñ din de bibarîne. Lê eger nasbûn û dostanî hebe, dîsan qirika rexnê tê badan, û hemû şasîtî û kêmasiyêñ dostan û hogiran, di bin felsefa (xal û xarzî) de ji bîra dibin, û rexne dibe pesneke bê hempa. Bi encama evan her du awayan jî, civaka me nezan û çavmiç dimîn e.

Bi rastî jî gava mirov çavêñ xwe li nav diyardeyêñ wêjeya jêrketiyan digerîne, kêm caran rexnê li pêş xwe dibîne. Ji roja ku HAWAR derket holê û heya îro gelek berhemêñ wêjê xwe berdane nava civakê, gelek nav û deng hatine dîtin û guhdarkirin, lê heya îro ew berheman hemû tenê li ber siha dil û hestan, dûrî pîvanêñ heş û zanînê hatine xwendin û nirxandin, loma jî, dergehê rexnekirina wêjê li ba jêrketiyan, wek Deham Evdil Fetah dibêje “*dergehekî kilîtkirî ye. Tu kesî ..... xwe nêzî ewî dergehî nekiriye*”. Lê mirov dikare bibêje, ku di van deh-panzde salêñ dawî de pêñûsine mizgînhilgir, bi her du zimanêñ kurdî û erebî, berxwe didin, ku vî dergehî li ser piştê vekin.

Hêjatirîn û berztirîn nimûne li pêş me îro Çegerxwîn e, evî mirovê ku heyş dîwan bi şûn xwe de hêştine, nav û dengê wî li her çar besêñ gewdeyê perçê, û li her deverêñ ku Kurd lê cîwar bûne, wek helbestvanekî kurd ï mezin belav bûye. Kesî heya îro jî xwe nêzî helbestvaniya wî nekiriye.

## Helbestvaniya Cegerxwîn (Bingeha helbestê)



Heyder Omer\ Elmaniya

- 1 -

Helbestvaniya Cegerxwîn. Ev babet, bivê nevê, navenda rexne ya wêjeyî cihê wê ye. Lê, rexne li ba me çî ye?. Li milê din, mirov dikare bipirse: Gelo rexne ya kurdî heye, an na?. Eger em boçûnêñ dîroknivíñ û rexnegirêñ wêjê, bi gelempêrî, bipejirînin, û digel wan bibêjin: Rexne zanîneke ji zanînêñ mirovatiyê ye, bingeh û têorêñ wê hen in, rexnegir, li ber ronahiya wan, wêjê dixwîne û tev dide, çê û neçeyêñ berhemêñ wêjeyî ji hevdu dike der, asoyêñ aferînê li pêş civakê, bi gelempêrî, û li pêş wêjевanan, bi taybetî, zelal û sayî vedike. Eger em weha biçin, û vê yekê bawer bikin, bersiv yekser wê diyar bibe, ku rexneyê li ba me

çimkê hem li devereke dûrî kurdistanê hatiye çapkiran, û hem jî, li gor texmîna min, zimanê wê ne kurdî ye.

Da em vê boçûna xwe xav nehêlin, û gotinên bê bingeh bernedin holê, em dê berên xwendevanan bi ber ve pêşgotinên, ku ji bo dîwanên Cegerxwîn hatine nivîsîn\*, de bidin. Ev pêşgotinan bi pênuşen rîzdarên wek O.Sebrî, Hemîd Derwîş, Kemal Burkay, prof . Qanatê Kurdo, Casimê Celîl, û Ordîxanê Celîl hatine nivîsîn, lê mixabin hemûyan jî xwe nêzî helbestvaniya Cegerxwîn nekirine, ew nedane naskirin, şûna wê di rîveçûna helbesta kurdî de diyarnekirine, tenê li gel naveroka helbesten wî mijûl bûne, ango tenê aliyekî aferînê dane xuyakirin, lê aliyê tewrî giring, ku wê naverokê dixe qulafetê aferîneke wêjeyî, ew jî durv û avakirin e, ji bîra kirine, tevî ku ewana her tim navê Cegerxwîn bi salixên wek helbestvan, biwêj, û şair ve girêdane. Weha xuyaye ewan rîzdaran ji bîra kirine, ku pêşgotinên berhemên hunerî, û kurtelêkolînan pirê caran, li nik miletên din, raperînen rexneyî di wêjeyan de teqandine.

Nivîsevanê ereb El-Cahiz, beriya ji hezar salî bêtir, weha çûbû, ku wate, ango naverok, li kêlek rîkan belavkirîn e, her kesek dikare wan bicivîne, û bixe hindir gotinên xwe de, lê her kesek nikare wan bixe hindir afrînê. Ev boçûn heya îro jî zindî ye, û wê her zindî bimîne, da bergeha, ku di navbera axiftina normal û aferînê de heye, ji bîra nebe. Rexnevanên îro jî weha diçin, ku huner durvkirin e, tenê durv dikare nivîsaran bike berhemine wêjeyî hunerî, *çimkê durv ji bo jiyanê rista herî giring e*, û hê jî pê de diçin û dibêjin,: *Durvê her berhemekê nîşana serkevtin an binkevtina wê ye.*

- 3 -

Livandina evê mijarê, bi hemû şax û xalêñ wê ve, barekî giran e, lêkolîneke fireh û demeke dirêj jê re divêñ, loma jî em dê wê ji çaxeke din re bihêlin, û tenê bingeha helbesta

Eger em wêjevanêن cîranan, yênu ku em Cegerxwîn bi giraniya wan dibînin, bînin bîra xwe, û tevger û çalakîyen ku berhemên wan di civakêñ wan de peyda kirine ji bîra nekin, hîngê nebûn, an qelsiya tevgera me ya rexneyî wê li pêş me şîlf û tazî xuya bibe, û em dê bibînin ka xelk gîhaye kû, û em li kû mane.

Wek nimûne, dikarim helbestvanê ereb Ebû Teyyib El-Mutenebbî, yê serdemâ Ebbasiyan, an jî Cewahirî yê hemdem nîşan bikim, ku pirêñ wêjevan û tevaya civaka me Cegerxwîn ji wan kêmter nabînin. Gava tu pirtûkxana Ereban tev dide, tu bi dehan û bîstan pirtûkan li ser van her du helbestvanan û wêjeya wan dibîne, gelek nivîsevan û rexnegiran xwe nêzî wan kirine, kîmasiyêñ wan berî serkeftinêñ wan, bê şerm û fedî, diyar kirine. Danûstandin, têkiliyêñ wan ci erêñî û ci neyêñî, dostanî û hogiriya wan, li ba rexnegiran nebûne xem û qisawet, û ne jî bûne egerên veşartina rastiyêñ wêjeyî û hunerî, ji ber ku ewana rexne baş naskirine, û ji bo pêşvebirina ziman, wêje, raman û civaka xwe xebitîne û dixebin.

Lê gava tu Cegerxwîn dipelîne, tenê tu pêrgî gotinekê dibe: Cegerxwîn helbestvanekî mezin e. Lê ka ev mezinahî heya kû ye?!. Sînorêñ wê, diyardeyêñ wê çin e?!. Bersiv nîn e. Eger hebe jî, ji çarçewa pesnêñ bê deyaxêñ zanistî bi dernakeve.

- 2 -

Di vê pergalê de, tenê dengê xebatekê bi ber guhê min ketiye, ew jî xebata Esker Şamilov e, ku li Azerbeycanê çap bûye. Prof.Qenatê Kuro, di pêşgotina, ku ji bo dîwana Zend-vista nivisiye de, çela wê dike. Pêjna helewsteke rexneyî berpirsiyar, li gor boçûna wî, ji wê xebatê tê. Lê mixabin ew neketiye destêñ min. Bi baweriya min, dengvedana vî karî, ji ber gelek sedeman, wê sînorkirî be,

helbestî girêdayî ye, û ya din li gel şêweyê derbirina helbestî bestandî ye.

Axiftina helbestî, di helbesta Cegerxwîn de, bi sê rûdawan diyar e, yek ji wan **ravabûn** e (eskere), ya din **yeşerî** ye, û ya sisîyê **xiroşanî** ye(cosî / hemasî).

Rexneya kevn, ji Erîstotalîs de bigir û pê de were, her tim bala xwe daye evê rewşê, ew bilind nirxandiye, lewre jî ravabûn û hêsanbûnê wek giringtirîn mercên rastbûna wateyan dibîne. Rêgayên derbirinê û alavên wê çiqasî cirbecir bin, derbirinê rasteqîn, ku ji wateyan ne kêmtrîr û ne zêdetir bin, an jî bêjeyen fosforî û xwedî pêjin bin, her tim ravabûn û hêsanbûn, li gor rexneya kevn, nirxitîn taybetmendiyêن şewe ne.

Hêsanîya bêjeyan sînor û nîşana evê ravabûnê ye, divê bêje eskera bin, xwendevan û guhdar li hember wateyên wan bêjeyan dudilî nemînin, wateyên wan yekser û bê cefa derbasbin hindirê heşan, û pêre jî divê pevekên helbestê bê girêk û servekirî bin, da “*wate beriya wan bighênin xwendevanan*” û cihêن xwe di dil û hestêن wan de bistînin.

Hemû wêjeyen cîhanê, nemaze ya ewrupiyan û di dû re jî ya Ereban, û Farisan û Tirkan, demek dûr û dirêj li ber siha vê têorê berhemên xwe afirandin, ta ku ev rîbaz, di çerxa nozdehê de, li hember hêrişen romantikan jar bû, û ji hev ket. Ji hîngê de pêjna rîbazên nû derket holê, ku bêtir xwe bi ser siha bêjeyan de pal didin, ne bi ser bêjeyan de, û zimanê aferînê pêre derbas qunaxine nû bû.

Gava em helbesta Cegerxwîn dixwînîn, ev rewş li nik wî sayî xuya dibe. **Bêjeyen** wî ji sînorêن wateyên zimanewanî û ferhengî bi dûr nakevin, sihêن wan nînin, ku mirov pê mijûl bibe, birame, wateyan bipelîne, çimkê **rava û hêsan** in, yekwateyî nin, zû û bi lez digihênen xwedevanan. Eger hin

Cegerxwîn, ku ew jî şaxekî wê mijara mezin e, ji bo vê lêkolîna xwe bikin babet û pêre mijûlbibin.

Dema ev babet ji min hate xwastin, ramanêن cirbecir li min civiyan û ez dudilî kirim, ji ber ku qada evê babetê, li nik me Kurdan, yekeke bûr e, kesî ta niha gîsnê xwe lênedaye, nekiriye şûv. Ji hêla din de, Cegerxwîn, di çavêن civaka me de, mamosteyê bê hempa hatiye nîşankirin, û gelek kesan, torevan, rewşenbîr û siyasetmedarêن kurd pesna wî dane û didin, çawa kesekî wekî min, li hember Cegerxwîn mîna şagirtekî ye, wê ewî (mamosteyê mezin) binerxîne?!. Lê meraqa hemdemiyê, ku ez pê bawer im, dudiliya min sar kir, û rê li pêş min hêsan kir.

Cegerxwîn di rûpelê 191ê de ji (Jînenîgariya min) dibêje: “*Rojekê li dikana mela Hesen, xortan doza ristekê li min kirin. Di hindirê dikanê de min rista (Em guhderz in) got..... Xelkê wan navan bi carekê li hawîr dikana mela Hesen civiyan û derê dikanê hate girtin. Yekî Xerab Babanî, mirovekî girs, bilind ko rengê Kurdên çiya dida xuyakirin, ew çeper cirand û xwe gihande derê dikanê. Çawa ez dîtim, axînek kişand û got: “Tiya, heyfa kurê bavan ko wilo dihn dibin!.. Vî camêrî hîngî xwendiyê, dihn bûye”*”. Lî min dengê xwe nekir û dev ji rista xwe berneda. Tenê heval pê keniyan. Zanîbûn ko ew nizanî ka ez ci dibêjim, nizanî ko doza serbilindiya wî û miletê wî dikim, . Nizanî ko dixwazim wî û bi milyonan weke wî ji bin darê zorê û setemê derxim, û ji pêlén xwîn, şer, berberî, dubendî, talan, şewatê bi şewitandina laşê xwe, bi dînîtiya xwe, bi van ristêن xwe, wan bigênim delavê serbestî û peravêن azadî û felatê”.

Ev boçûn helwesteke têorî ye, ji hêlekê de asta zanîn û hişyariya civakê diyar dike, û li aliyê din, karmendiya helbestê nîşan dike, lewre jî mirov dikare du taybetiyêن sereke û giring, ên bingeha helbesta Cegerxwîn, di nav xêz, û paş gotinêن wê de bibîne, yek ji wan li gel zimanê axiftina

Helbesta Cegerxwîn her tim bi vî awayî li gel bêjeyan dide û distîne, nikare ewan ji bo wateyên nû û asofireh bixebitîne. Wek nimûne, Cegerxwîn dibêje:

### Zû nûjenî bixwîne.

Bese kevneperekî.

Tu guh mede melakî.

Tu guh mede feqîkî.

(Hêvî. Rû: 6)

Mînakeke din:

Ev welatê payedar û serbilind û bê xwedî.

Sed emanet, ey birader! Vî welatî bernedî.

Tev bihişt e, mîrg û deşt e, qaz û qumrî tim di nav.

Nakevî destê me carek, ta bi xwînê avnedî.(Hêvî. Rû: 28)

Eger ziman di axiftina normal de metiryalekî pilastîkî yî li ber destan her amade ye, bê pêjn û bê aso ye, ew di axiftina wêjeyî de, çi pexşane be, çi helbest be, metiryalekî fosforî yî bi şewq û ronahî ye. Lê xuyaye haya Cegerxwîn ji evê yekê nîne, ji ber ku bêjeyen evan her du mînakan sînorkirîn e, nikarin wateyên ferhengî bi şûn xwe de bihêlin, û ber bi hinek wateyên din de bişimitin, lewre jî bûne sedema gurbûna kela dilê helbestvan, lê giyanê helbestî talankirine û çelmisandine.

- 4 -

Ev rewşa bêjeyan û **ferhengiya zimêñ bûye hêmanekî berz û hêzdar ji bo xiroşaniya axiftina helbestî** li nik Cegerxwîn, û ew bêgav kiriye, ku bêtir bala xwe bide bilêvkirina bêjeyan., û ên bi teqil û xwedî hukariyeke derveyî vebrêje. Lewre jî tu di helbestên wî de, pirîcar pêrgî bêjeyen, ku devan û gulman dadigrin, dibe. Wek ( şer, ceng, serxwebûn, mirovperest, serbest, sorgul, dijmin, mîrkuj, xwînxwar, aştîwxaz, koledar ....), û pêre jî lêkerên fermanî di helbesta wî de pir dibin.

caran xwendevan û guhdar pêrgî hinek dijwariyan jî bibin, û di wateyên wan bêjeyan negihênen, teqez ev yeka ne ji ber dijwariya bêjeyê ye, belê ji ber ku ewana zimanê xwe nexwendine û pê nizanin. Em dikarin çend mînakan nîşan bikin:

Li jor firok e, li jêr tang û top.

Ji xwînê sor bûn, hemî der û şop.

Dijmin hilweşand tev gund û bajar.

Zar û zêrcê kurd mane ber dîwar.

(Berhevoka Kîme ez û Ronak. Rû: 65)

Di helbesteke din de dibêje:

Hezar salin em gerdenxwar û mest.

Tim çav şikestî, reben dîl û mest.

Dijmin bo xwe xwest, me jî jê re xwest.

Bo dijmin nîvişk, tenê bo me dew. (Jêrera berê. Rû: 27)

Ravabûna bêjeyen evan her du nimûneyan gelekî berz e, (firok, tang, xwîn, dijmin, gund, bajar, gerdenxwar, şikestî, dîl). Pêre jî **pevekêñ** her duwan servekirîn in, hêsan in, nikarin xweneran ber bi pûnijiyê de bikşenin. Ne tenê weha, belê **mecazêñ zimanewanî jî gelekî sayî** û eşkeran in. Wek nimûne, her du bêjeyen (Nîvişk û dew) ku wateyên ferhengî beradane, û yeka din nîşan kirine, dîsan sergirtî nebûne, mirov zû têdighîne ku mebesta helbestvan ne (nîvişk û dew) e, belê her tiştê biha û yê erzan e, her tiştê bi kêr tê, û yê bi kêr netê ye, her tiştê baş û yê ne baş e. Bi ser de jî ev peyvelîstik alaveka derbirin û rewânbehîya kevn e, ku bi zimanê erebî jê re (kînayet) tê gotin.

Bikaranîna bêjeyan bi evî awayê ferhengî dibe ûşt û egara **yeşeriya axiftina helbestî**, ku hîngê bêje bê pêjn, bê aso dimînin, û naşimitin. Ji ber vê jî tê xuyakirin ku helbestvanê me bi asoyê cirbecir yê bêjeyan û wateyan ne bawer e.

Guhertina cihêن hêmanêن pevekê ne tenê roleke zimanewanî heye, belê ev yeka şêweyê derbirina helbestî jî ciwantir dike. Wek nimûne, Cegerxwîn dibêje:

**Wekhev bibin tev êl û ol.**

**Tev şîn bibin ev deşt û çol.**

(Hêvî. Rû: 35).

Her yek ji her du birêن vê malikê pevekek bi serê xwe ye, normaliya hevoka yekê bi vî awayî ye (Tev êl û ol wekhev bibin) û ya duduwe jî weha tê ( Ev deşt û çol tev şîn bibin). Lê gava helbestvan lêker bi pêş de anî, û kirar bi paş de xist, hîngê du mebestêن zimanewanî û ciwanî pêk anîn, û her du jî ji bo ramana xwe kirin karmend.

Ji hêla zimanewanî de, paş û pêşxistina hêmanêن hevokê wateyê teqez dike, û ji warê ciwanî de, rêzbendê (qafîye), hinekê nerm dike. Rêzbend cihê rawestinê ye, cihê bêhnvedanê ye, loma jî hêjayî peyvên bê tevger e, aango xweristiya rêzbendê şûna wê ji bo navan hêjatir dibîne, ne ji lêkeran re, çimkê lêker tev de tevger e. Bi vî awayî helbestvan naveroka pevekê teqez dike, ku wekhevî beriya her tiştî xem û qisaweta wî ye, û li milê din jî rêzbendê hinekê nerm dike.

Lê mixabin Cegerxwîn nikare evan serkeftinan biparêze, an bi rê ve bibe, ji ber ku pirê caran lêkerên fermanî milên wan ber bi jêr de xar dikin, û zora wan dibin, û pêre jî ciwaniya helbestê birîn dikin, ewê ji heyama helbestî bi dûr dixin, û helbestvan jî dixin şûna şîretvan û fêrkeran.

Gelek nivîsarên Cegerxwîn ji bo vê boçûna me mînakên hêja ne, nemaze dîwana (*Zend-Avista*). Hemû nivîsarên di hindir vê dîwanê de nikarin şûna xwe di meydana helbestê de bibînin, ji ber ku kêş û rêzbend û lihevhatina kîtan nikarin, bi tenha xwe helbestê bafirînin.

Hinek hewildanêن Cegerxwîn, ku ber bi avakiraina helbesta nû de qevaztine jî, nikarîbûn ji vî şêweyê xiroşanî rizgar bibin, wek çawa helbesta ( Kîme ez ) dide xuyakirin. Cegerxwîn di vê helbestê de, heyâ karîbû, berxwe daye, pêdiviyêن awayê avakirina kevn, wek kêşê û rêzbendê (qafîye) bi paş pişta xwe de bavêje, û helbesta xwe li gor awayê nû binivisîne, lê dîsan jî heyama xiroşanî li ser avakirina wê helbestê desattdar e.

Heye mirov bibêje, ku taybetmendî û nîr û mercêن civakî û rîzanî yên dema Cegerxwîn ji hêlekê de, û taybetmendiyêن babet û naverokên xiroşanî û neteweyî, ji hêla din de, rê li pêş axiftina helbestî, ya Cegerxwîn, diqelaştin, û berê wê ber bi vî awayî de dikşandin. Bi baweriya min ev boçûn ne rast e, ji ber ku pirê helbestvanê wê demê ji evan babetê neteweyî bi dûr de neçûne, lê pirê wan neketine ber dava vê yekseriya sar, belê derbirinê wan, zimanê axiftina wan nerm in, bi hêsanî diherikin, bê ku ji heyama helbestî bi dûr de bikevin, û ji saloxanan de nêzîk bibin.

**Helbesta Cegerxwîn a neteweyî û civakî hêjaye, ku wek saloxanan, di civatêن mezîn û pêşandanen de bête gotin,** ji ber ku dikare derûnên xweneran zû germ bike, û wan li gel civînê û pêşandanê zor bibestîne. Lê bi rastî şopa wê jî hêza xwe ya hunerî zû wenda dike.

Xuyaye haya helbestvanê me ji vê yekê hebûye, lewre jî berxwe dide, da bandûra wê hinekê jar bike. Ev berxwedan li ber dergehêن avakirina pevekê diyar e. **Cegerxwîn pirîcar peveka xwe ji sîstema normal bi der dixe**, û cihêن hêmanêن wê (kirar, bireser û lêker) diguhêre, ewan bi pêş û paş hevdu dixe.

Bingeħa sîberê, di helbestê de, bi alîkariya wênekêşıya zimanewanî û şimitîna bêjeyan tê xuyakirin û naskirin, loma jî wênekêşıyê di meydana aferînê de roleke nirxbîha heye, ku dikare ji bo zindibûna derbirinê bibe alava tewrî giring, lê tiştê balkêş ewe, ku divê têkiliya wêneyên hunerî li gel dem û rîveçûna civakî û zimanewanî ji bîra nebe, da ew wêneyan karibin zindibûna derbirinê diyar bikin û biparêzin.

Tevî ku helbesta Cegerxwîn nirxê wênekêşıyê û rola wê baş dizane, û derbirina zimanewanî pirê caran mebesta xwe di siha wê de dibîne, lê şeweyê derbirin û wênekêşıya hunerî li ba wî her tim xwe bi ser alavê kevn de pal dide, lewre jî her tim di çarçewa (kînayet)ê û berehevdanê (teşbîh, wekhevkirin) de dimîne. Wek nimûne, Cegerxwîn dibêje :

**Rengê bêjen kûr dinalim, xanî bûye rengê çal.** (Hêvî. Rû : 67).

Ev berehevdan (xanî bûye rengê çal) dikare me bi rewşa û pergala, ku helbestvan tê de ye, agahdar bik,e, û şanî me bide ka çiqas ew bêhteng bûye, lê li hember livandina hestêñ xweneran ji hêz dikeve, lew hebûna peyva, ku têkiliya wekhevbûnê di navbera du tiştan de peyda dike, ku mirov dikare wê bi (**alava berehevdanê**) binavîne, bandora berehevdanê hinekê sist û qels dike.

Berehevdan alaveke wênekêşıyê ye, rengdêrên tiştékî ji bo tiştékî din dixebeitîne, wek çawa berehevdana jorîn diyar dike, ku kelbestvan her du rengdêrên (teng û tarî) ji çalê istandine, û bi ser xanî ve kirine. Lê berehevdan bi xwe nizimtirîn û jartirîn alava wênekêşıya hunerî ye, bi ser de jî hebûna peyva (bûye) têkiliya wekhevbûnê di navbera xanî û çalê de kêmîr kiriye, û dide xuyakirin, ku xanî ne çal e, lê wek wê bûye. Cegerxwîn pirê caran evî cureyê berehevdanê bi kar tîne, wek çawa evan mînakên jêrîn diyar dikin :

Cegerxwîn, di vê dîwanê de, ji bîra dike ku ew helbestê dinivisîne, tenê ew waneyan ji bo şagirtan pêşkêş dike, û bi ser de jî nikare rola mamosteyan bilîze, ji ber ku waneyen wî bê şirovekirin in, tenê fermanan dide. Wek nimûne:

**Tu rîzan be carek, siyaset bixwîn.**

**Bi vê xwendinê rîçika xwe bibîn.** (Zend-Avista. Rû: 55).

**Bibe Partîzan bi rist û dirist.**

**Digel Partîzanan here dest bi dest.** (Zend-Avista. Rû: 57).

**Bibe dezgevanek bilind û mezin.**

**Tu dezgê bixwîn, ci mîr û ci jin.** (Zend-Avista. Rû: 98).

**Bibe ajiwek, hişiyar û çeleng.**

**Tu her tiştî bajo, ci lorî , ci teng.**

**Dibî rojekê ev bi kîrî me bê.**

**Nikarin xelasbin ku ev rî nebê.**

**Gerokê, firokê tu bajo heval.**

**Bibe ajiwekî pir çeleng û şepal.** (Zend-Avista. Rû : 145).

Şeweyê derbirinê di bin tîna (hêz) evan lêkerên fermanî û yekser de (rîzan be, bixwîn, bibe, bajo) milşikestî xuya dibe, nikare hilkişe asoyen helbestê. Bi ser de jî Cegerxwîn qirika bêje û rengdêran (sîfet, adjectiv), ji bo xatirê rezbendê badide, û (teng) li şûna (tang) dinivisîne, û her du rengdêrên (çeleng û şepal) di cihêن, ku ne yên wan in de, bi kar tîne, ji ber ku rengdêrên wek jîr, jêhatî.... ji bo ajoker bi kar têن, lê her du rengdêrên (çeleng û şepal) di meydana ciwaniyê têne xebitandin.

- 5 -

**Helbest aferîneke xwedî pêjn e. Ev lêkerên fermanî jî pêjnê dikujin, wêneyên hunerî talan dikin, sîberê (xeyal) jar dikin, û pêre jî axiftin dibe axiftineke normal.**

Lê mixabin Cegerxwîn, hin caran, karmendiya wênekêşiyê ji bîra dike...Belê. Ew ji bîra dike, ku wênekêşî alaveke ciwanî ye, şeweyê axiftinê ji asta normal dikşîne asta ciwan. Lewre jî wênekêşî li ba wî, ne tenê xwe bi ser berehevdanê û kînayetê de pal dide, belê pirrê caran dadikeve asta salixdaneke sar jî, wek ku dibêje:

**Bisk bi têlê, ser bi zêrê!**

**Pir çelengê xwes ciwanê!**

(Brehevoka Kîme ez û Ronak. Rû: 205).

**Nazikê şox û şepalê!** (Jêderâ berê. Rû 206)

**Ji kuştina dilan re pir xurt û jêhatî ye.**

(Jêderâ berê. Rû: 208).

**Pir şepalê, şox û sengê!** (Hêvî. Rû: 72).

Gava wênekêşî ji ezmanê aferînê dadigere asta rêzkirina bêjeyan, hîngê alavê rewânbehîya kevn li ser şeweyê derbirina helbestvanan hukardar dibin, û wan ber bi peyvelîstinan de dikşenin. Cegerwîn jî ketiye ber dava wê yekê, û Pirê cara (cînas û tîbaq) bikar anîye, wek Cawa dibêje:

**Cîger xwîn bû, ji derdan.**

**Min can û dil bi derdan.** (Hêvî. Rû: 95).

**Hin bi rewşa min kenîn, û hin girîn.** (Hêvî. Rû: 115).

Peyva (derdan), ku dubare bûye, du wate hene; cara yekem wateya nexwaşiyê dide, û cara duwem wateya wendakirinê dide. Ev cûreyê xebitandina peyvan, li ba rewânbehîyên Ereb bi (cînas) tê navandin, ku peyvek ji bo du wateyên ji hevdu dûr in, tête xebitandin. Her weha her du peyvên (kenîn û girîn) jî dijber in, rewânbehîya erebî vê yekê bi

**Bejn û bala rengê serwa.** (Hêvî. Rû : 114).

**Wek gurê birçî gihande pişt girik.** (Hêvî. Rû : 116).

**Ebrû ji rengê dalê.** (Hêvî. Rû : 123).

**Dêm hingiv e, por wek şevan.** (Hêvî. Rû : 123).

Ev mînakên jorîn didine xuyakirin, ku ewana dest ji alava berhevdanê ( reng, wek, ji rengê, wek ) bera nedane, lewre jî rengdêra, ku di navbera her du aliyên berhevdanê de heye, hinekê jar û tenik e.

Lê xuya ye ku Cegerxwîn neyêniya evê yekê baş naskiriye, loma jî carcaran alava berehevdanê bi kar nîne, wek çawa di evan mînakên jîrîn de nima ye :

**Cen gewher û ebrû kevan.** (Hêvî. Rû : 145).

**Du birhêñ reş kevanê min.** (Hêvî. Rû : 91).

Bi rastî jî gava alava berehevdanê jê dikeve, hem derbirin xurt dibe, û hem jî wêne ciwantir dibe, lê mixabin Cegerxwîn nikare evî cureyê berehevdanê bafirîne, belê her tim xwe bi ser bermayên pêşîyan de pal dide, mebesta xwe li ba wan dibîne, û dibe deyndarê wan, nemaze jî di helbesta evînê de, wek çawa wê di rûpelên bêne de bête diyarkirin.

Cegerxwîn ne tenê evê alava wênekêşiya hunerî dixebeitîne, belê wêneyên wî pirîcar di navbera (kînayet)ê re diyar dibin. Kînayet ew e, ku peyvek dibe nîşana hinek regdêrên din, wek çawa evan nimûneyên jîrîn diyar dîkin :

**Bi devken û bi yarî.**

**Sekir ji dev dibarî.** (Berhevoka Kîme ez û Ronak. Rû : 182).

**Lê ji çavan tîr dibarin.** (Jêderâ berê. Rû : 422).

**Di dil de agîr û pêt e.** (Hêvî. Rû: 96).

Her du peyvên (şekir û tîr) bûne zîmbolên regdêrên dilberê, ku hem gotin û axiftina wê xwaşîk û şêrîn in, û hem jî awirêñ wê tûj in, dil-êş in, û bi şewat in. Weha jî her du peyvên (Agir û pêt) bûne nîşana êşen giran.

**Werdan ji nêv zulfan derîn, şula binefşê têwerîn.**

**Bala û qedda er-erîn, her yan li ser marê res e.**  
(Şârîn kilasîk ên Kurd.Rû: 26).

Weha jî dawîya helbesta Cegerxwîn nikare ji bandora pêşîyan rizgar bibe, û her car ew navê xwe di malika dawî de bi cih dike. Ev xalek li nik hemû kilasîkên kurd diyar e, ku ewana navê xwe di dawiya helbestêne xwe de digotin. Belkî ev yeka, di dema wan de, ji ber nebûna çapemeniyê bû, û mebesta wan ew bû, ku berhemên xwe biparêzin, lê domkirina wê di dema Cegerxwîn de, nemaze jî deh – panzde salên dawî, dibe şûna pirsekê, û awayê avakirina helbestê di siha wan pêşîyan de dihêle.

Weha xuya dibe ku şêweyê derbirina **Cegerxwîn, nemaze di helbesta evînê de, yekekî bîrî ye**, ango ew aferînên pêşîyan, ên ku xwendine û jiber kirine, tîne bîra xwe, û derbirin û wêneyê xwe ji wan werdigre. Evê yekê Cegerxwîn xistiye ber dava **carandin û dubarekirinê**.

Her kesê li birê evînî, ji dîwanen wî, vegere, wê bibîne ku çawa û çiqasî Cegerxwîn bûye dîlê carandin û dubarekirinê. Dilber her tim şox û şeng û şepal e, ebriwên wê dipesine, û her car jî eawana dal in, heyv in, kevan in, (zirav û xar in), bejna wê mîna dara serweyê ye, (zirav û dirêj e), lêvên wê her car şérîn û qend in, memikên wê her tim sêv in, biskên wê lihev badayî û wek marê reş bi ser sîng de daleqandîn e. Bi gotineke din, mirov dikare bibêje, ku **ferhenga zimanewanî ya evîndariya Cegerxwîn di bin dubarekirinê de milxar e**.

Dubarekirinê, ne tenê roleke neyênî di ciwaniya helbestê de heye, belê bi ser de jî hewesa xwendinê li nik xweneran sar dike, û hin caran jî dibe egera êşen derûnî.

- 7 -

(Tîbaq) dinavîne. Eger ev yeka ji hêlekê de dewlemendiya ziman û ferhenga helbestvan diyar dike, lê ji hêla din de rewanbêjî û zindiya derbirinê lawaz dike, û bi ser de jî dikare bibe nîşana sarbûna hestêne helbestvanan.

- 6 -

Nizanim ev salixdanênek yekser çiqas dikarin xweneran bi naverokên xwe bawerkirin bibin, an hestêne wan bilivînin. Bi ser de jî her tim **wêneyê Cegerxwîn ji bermayêne pêşîyan diherikin**, û nikarin ji bandora wan rizgar bibin. Her ku tu helbesteke wî, nemaze di warê evînê de, dixwînî, Melayê Cizîrî, an Pertew Begê Hekarî, an jî Macin yekser têne bîra te. Wek nimûne, helbesta “*Dil ji min bir*” ku di dîwana “*Kîme ez*” de ye, Bi carekê nikare ji dava bandora Melayê Cizîrî bi derkeve, bi ser de jî, ne tenê li paş helbesta Cizîrî dimîne, belê hinek wêneyêne wê birîn dike.

Her du helbestvan (Cizîrî û Cegerxwîn) dilberê dipesinin, lê tu pê hay dibî ku dilbera herduwan yek e, çimkê bejna dilbera herduwan **serwe ye**, gerdenê wê **şemal e**, dêmê wê **roj e**, ebriwên wê **nûn** in(Tîpa nûn a erebî), **heyv in**, û **kevan in**, ango zirav û xar in, dilbera Cizîrî **awir piling e**, ya Cegerxwîn **awir şûr û şêr e**, ya herduwan **şox e**, **şeng e**, **nazik e**, **şêrîn e**, **ciwan e**. Biskên dilbera Cegerxwîn pirê caran li hev badayî dirêj û reş in, li ser sîngê sipî wek marê reş daleqandî ne:

**Sînga sipî resmar li ser.** (Hêvî. Rû: 185).

**Rengê mar in reşgûlî.** (Berhevoka Kîme ez û Ronak. Rû: 422).

Lê ev wêne li ber deriyên aferîna Elî yê Herîrî milxar e, ne ji aferînên Cegerxwîn e, çimkê Herîrî, beriya wî, bi sedê salan weha çûbû û gotibû:

Ev nimûneyê jorîn li ser kêsa Wafir ya urûda erebî hatiye sazkin, eger şûna organên pevekê neyête guhertin, dê kêsa helbestê ji hev bikeve.

Lê tiştê balkêş ew e, ku Cegerxwîn, her tim dîlê vê yekê namîne, belê ewî li kêlek hemdemên xwe, berxwe daye, da berê kilasîka kurdî ji (urûda erebî) bide alîkî din, **û ber bi kêşen folkilora kurdî de bikşîne**.

Tevî ku em nikarin serkêsiya evê gava giring bidin dest wî, ji ber ku helbesta Kamiran Bedirxan, ku dîwana wî “*Dilê kurên min*” sala 1932yê çap bûye, li gor evan kêşen folkilorî hatiye hûnandin, û li ser bingeha kîtan ava bûye, **lê helbesta Cegerxwîn jî para xwe xistiye evê gava giring û ew li ba kilasîkên kurmanciya jor çespandiye, beriya ku helbesta kurmanciya jêr jî berê xwe bide wan kêşan.**

Pirên helbestên Cegerxwîn bi awa û formên **bangan** (kît) hatine hûnandin, gelekên wan, wek ku Şamîlov dibêje “*şeşbangî ne, heftbangî ne, heyştbangî ne, dehbangî ne, û mîna stiranên kurdî bendên wan li hev têن, û bi tegil têne gotin û stranê*” ji ber ku li saz in, û li gel rîzbendê dilsoz in.

Dilsoziya Cegerxwîn di vî warî de, weha diyar e, ku ew ji bo xatirê parastina kêşê pirîcar bêgavî bikaranîna hinek bêjeyên bê sûd bûye, ku di hevokên wî de cih girtine. Wek nimûne:

**Rojê ko min dî bi çavan.** (Hêvî. Rû: 125).  
**Min xweş bi çavan lê nerî.** (Hêvî. Rû: 123).

Peyva (çavan) di evan her du mînakên jorîn de bê sûd e, mirov dikare wê bavêje, bê ku wate birîn, an wenda bibe, ji ber ku her du lêkerên (dî û nerî) şûna wê digrin, û mebestê diyar dikan.

Eger em werin warê **kêşê û awaza** helbestê, em dê helbestvanê xwe **dilsozê kêşê** bibînin, destan ji wê bera nade, û ji rêça kilasîkan bi der nakev. Ma me beriya vê nedîtibû ku ew çiqas dilsozê wan bûye, ci ji warê peyvan, û ci ji warê şewe û wênekêsiya hunerî ve?!..Bi ser de wek wan urûda erebî jî dixebeitîne.

Pirên helbestên Cegerxwîn, ku awaza urûda erebî xebitandine, kêşen Wafir, Remel û Serî’ bi kar anîne. Wek nimûne, ew kêsa Remel bi kar tîne, gava dibêje:

**Xelkê ev dinya dibînim warisê Qarûne tev.**  
**Sed şikir min warisê Xeyam û Pirşan û Şeref.**

( Agir û pirûsk. Rû : 194 )

Lê ew jî mîna kilasîkên berê bi kêsa urûdê dilîze, û pêlikekê bi ser ve dike, wek çawa ev nimûneyê jorîn dide xuyakîrin, ku ewî pêlikek bi ser pêlikên kêsa Remel ve kiriye. Dr Îzedîn Mustrefa Resûl vê kirinê bi kêsa mustezad dinavîne.

Dilsoziya helbestvanê me ji bo urûda erebî weha diyar dibe, ku ewî hin caran ji bo parastina rastiya kêşê organên peveka xwe bi paş û pêş hevdu xistine, ji dêvla ew bibêje ( Pîrî bi min gihişt û ciwanî çû ), û ji dêvla bibêje ( me kirîvî di emrê xwe de nedîbû ) gotiye:

**Bi min pîrî gihişt û çû ciwanî**  
**Şikest û çû ji ber boxê birîvî.**

.....

**Ewê dî tev me daye ber piyên te**  
**Di emrê xwe nedî bû me kirîvî.** ( Agir û Pirûsk. Rû : 264 )

bûye, ta ku ewî berxwe daye para xwe bixe warê têorî de jî, vê lomê ewî lêgerîneke fireh di vî warî nivisandiye, û “Hespêن xweşxwanêن kurdi” şirovekirine. Beşek ji vê lêgerînê, ku çar hespan şirove dike, di hejmara 22ê a Hawarê de belav bûye.

Ji vê pê ve, helbesta Cegerxwîn bi du-sê formên kevn diyar dibe, lê pirêن wan an **mesnewî** ne, ku rêzbenda her du birêن malikê yek kît heye, ji ya malikên din cida ye:

**Şoriş dest pêkir qêrîn û gurmîn.**  
**Gule barandin li hawîr xurmîn.**

**Li jor firoke, li jêr tang û top.**

**Ji xwînê sor bûn hemî der û şop.**

(Berhevoka Kîme ez û Ronak. Rû: 65).

An jî çarîn in, ku her sê xêzên pêşîn yek rêzbend heye, lê ya xêza çarê hem cida ye, û hem jî ta dawiya çarînan bê guhertin dimîne:

**Agir û pêta evînê.**

**Awirêن wê lebşêrînê.**

**Kuştime roja evînê.**

**Ah û nalîn hey hewar.**

**Pir divêm carek bibînim.**

**Perdeya ser rû hilînim.**

**şerxweş û bê tîn bimînim.**

**Ah ji bejna wek çinar.**

(Hêvî. Rû: 148).

Weha xuyaye, ku **Cegerxwîn di siha pêşîyan de pal** daye, ji bermayêن wan bi dûr de neçûye, her car û li her helwestekê destê xwe li ber wan vekirî, ewan jî çekûs nebûne, her tim pêre camêr bûne, û ji bo şewe û derbirina wî bûne alîkarên bê hempa.

- 8 -

Ev boçûn û rayêن me dikarin pirsekê li ba xwendevanan bilivînin: Gelo Cegerxwîn li kû ma ye?!. Te Cegerxwîn

Ev kêmasî li ba Cegerxwîn pirêcaran diyar dibe, û destlatiya kêşê li ser wî sayî dide xuyakirin, wek çawa di vê mînaka jêrîn de nima ye:

**Macek ji du lêvan bide, ey lêvseker!.**

(Berhevoka Kîme ez û Ronak. Rû: 195).

Hin carên din hewesa diristkirina kêşê bûye sedema jibirkirina rîbazên zimanewanî, wek çawa ev mînaka jêrîn diyar dike:

**Van mexolan kirne talan.**

**Bax û gulzarê di min.** (Hêvî. Rû: 65).

Ji dêvla bêje ( gulazarêd min) gotiye ( gulzarê di min ). Pergala gelejmarî, di liqê Botanê de ji kurmanciya jor, bi paşkîta (an) pêk tê (gund – gundan), lê gava navekî ku di vê pergalê de be, bi ser navekî, an bernavekî din ve bibe, hîngê verêsek peyda dibe, û paşkîta (an) dibe(en),(gundêñ me). Lê di liqê Hekarê de dibe (ed), (gundêñ me). Cegerxwîn ev mînaka jorîn bi liqê Hekarê gotiye, lê ji bo diristkirina kêşê dengdêra ( **i** ) xistiye paş tîpa ( **d** ), ku mîna daçeka ( **di** ) bûye, û li derveyî rîbaza rîzimên çûye. Cegerxwîn gelek caran evî awayî, ji bo xatirê kêşê, bi kar tîne, wek çawa dibêje:

**Em kuştiyê çavêن di reş û dêmêن gulîn e.** (Hêvî. Rû: 75).

**Pir kuştiyê çavêن di belek vane me dîne.** (Hêvî. Rû: 75).

**Dane ber lêvêن di min sîng û qirik.** (Hêvî. Rû: 115).

Tevî ku ev yeka din hin zaravêن herêmî de tê xebitandin, û dide xuyakirin, ku Cegerxwîn gelek zaravêن Kurdan dizane, lê bi baweiya me diristkirina kêşê bûye sedema hebûna kîta (**di**) di evan her sê mînakan de, û pêre jî rîzman bûye qurbana vê yekê.

Bi vî awayî tê xuyakirin, ku **kêş li ser bingeh û avakirina helbesta Cegerxwîn gelekî rikdar e**, û ew xemxwerê wê

## Jêder û çavkaniyêñ lêkolînê:

### a. Bi zimanê kurdî:

1. Cigerxwîn, Kîme ez û Ronak. Weşanên Deng, çapa duwem, Istenbul 1993.
2. Cigerxwîn, Zend-Avista. Weşanên Roja nu 2, nimra çapê ne diyar e, Stockholm 1981.
3. Cigerxwîn, Şefaq. Weşanên Roja nu 4, nimra çapê ne diyar e, Stockholm 1982.
4. Cigerxwîn, Hêvî. Weşanên Roja nu:6, nimra çapê ne diyar e, Stockholm 1983.
5. Cigerxwîn, Jînenîgariya min. Weşanên Apec , çapa yekemîn, Stockholm 1995.
6. Cegerxwîn, Agir û pirûsk. Weşanên Avesta, çapa çarem. Stenbol 2003.
7. Abdulreqîb Yûsuf, Shaîrên klasîk ên Kurd. Weşanên Jîna nû 17,çapa yekemîn,Uppsala , Sweden 1988.
8. Prof. Qanatê Kurdo, Tarîxa edebyata kurdî 1. Weşanên Roja nu, nimra çapê ne diyar e, Stockholm 1983.
9. Dr.Husêن Hebeş, Raperîna çanda kurdî di kovara Hawar ê de. Belgeha Hogir, çapa yekemîn, Bonn 1996.
10. Dr. Ebdil Mecîd Şêxo, Kovara çiya. Awêna çanda kurdî li Ewropa 1965 – 1970. weşanên Dengê Bakur, çapxana Adar Graphics, çapa yekemîn, Elmanya 2003.
11. Deham Evdil Fetah, Nêrînek Rexneyî li helbesta kurdî, çapxana elkatêb el-erebî, nimra çapê ne diyar e, Dîmeşq 1992.
12. Heyder Omer. Evîna Cizîrî û Cegerxwîn. Lêkolîn. kovara PIRS, hejmar 2. sal 1993. Sûriyê.

### b. Bi zimanê erebî :

- 1.الدكتور محمد غنيمي هلال, النقد الأدبي الحديث, دار العودة بيروت 1987, رقم الطبعة غير معروف .
1. Dr . Mohammed Xuneymî Hîlal, Rexneya wêjeyî ya nû.
2. الدكتور شكري محمد عياد, المذاهب الأدبية و النقية عند العرب و الغربيين, سلسلة عالم المعرفة رقم 177, الكويت 1993.
2. Dr.Şukrî Mohammed Eyyad, Rêbazên wêjeyî û rexneyî li nik Eereban û Rojavayiyan.Çapa yekem. Kuwêt 1993.

xiste paşa pêşîyan, li gor nerîna te, ew bûye dengvedana wan. Ma ew bê taybetiyêñ kesayetî ye?!

Belê...Ev pirseke şûngirtî û balkêş e.Lê wek çawa dîwanêñ wî li ser du beşan parvekirîn in, bersiva vê pirsê jî wê bi du awayan be, her du jî wê hevudu tewaw bikin.

Çiqas em hezkirêñ Cegerxwîn bin, ray û nerînêñ xwe ji dil û hestan, dûrî boçûnêñ heş û rîbazêñ rexeneyê bidin, em nikarin, di tengä helbesta evînî re, Cegerxwîn ji paşa pêşîyan, nemaze Melayê Cizîrî, bi derxin. Her helbesteke wî, her peyveke wî, her wêneyekî hunerî ewan pêşîyan tîne bîra me, her tim li wan vedigere, û derbirinêñ wan bikar tîne.

Cegerxwîn jî di vê tengê re li xwe mikur tê. Dibêjin carekê ji wî hate pîrskirin, ku akama Cizîrî çiqasî li helbesta wî heye, ew bi vî awayî bersivê dide :"Eger ji dîwana Cizîrî pê ve tiştek di tûrkê min de tune be, ma çawa bandora wî wêli min nebe?!".

Lê helbesta civakî û neteweyî, bi şêweyê wê yê xiroşanî, bi peyv û têgehêñ nû, bi naverokêñ hemdem, bi kêsên lezok û awaza xiroşanî, bi ser de jî rîzgarkirina kilasîka kurdî ji bêjeyên biyanî, kesayetiya Cegerxwîn a hunerî eşkera û sayî diyar dike, ewî mirovî karîbû ev têkiliya dijwar, ku di navbera naverokêñ nû û durvê kevin de heye, hêsan bikira, temriya kilasîzma nû di wêjeya kurdî de bigirta, û gelek helbestvanêñ pey xwe, ta roja îro, di paşa xwe de bihêştana.

\* Weşanxaneya Avesta, li Istenbolê, hemû diwanêñ Cegerxwîn jî nû ve çap kirin. Tevî ku ev yeka gaveke nirxbîha ye jî, lê mixabin ewê hemû pêşgotinêñ wan dîwanan jê avêtin, bê ku zanibe ewê bi vê kirinê diyardeyeke rexneya wêjeyî kurdî xiste ber lepêñ wendakirinê.

Paşetiya ''Eşkanî'', gelek hewldanê zîndî kirina evestayê kirin.


''Erdeşerê Babek''di salêن navbera 224-241 z jiyaye.

Ferman da ku Avesta ji nûv de were berhev kirin, bi vê armncê peywirderekî bi navê ''Tenser'' peywirderekir (wezîfedarekir).

Wî jî bi arîkariya kesên din Avesta ji nûv de berhevkir û nivîsand û di heman demê de rave-yek(Şerih-ek) jêre nivîsî û navê wê jî danî Zend û Avesta.

Helbestêن Gata li ser kîteyan hatine nivîsandin û ew 7,8,10,11,12,16,19, kîteyîne

Alfeba ku Avesta pê hatiya nivîsandin 44 tîpin, ew ji rast ber bi çep ve tê nivîsandin.



A photograph showing three columns of handwritten Avestan script in black ink on a white background. The script is cursive and appears to be a personal or working copy of the language.

<sup>10</sup> Alfabeşa Avestayî

**Mînaka diwemîn:** Çend helbest li ser perçeyek çerim hatine dîtin di şikefta ''Cêşanê'' de ya ku nêzîkî bajarê Silêmaniyê ye, li başûrê Kurdistanê, ew helbest bi zareveyê Goranîne,

berî 1400 salî ev helbesta li jêr hatiya nivîsandin, wê dema ku mislmanan êrîş di birin ser bajarê Şarezûrê û derdorêن

## Wêjeya Kurdî berî Îslamê

Weke ku tê zanînin wêjeya Kurdî berî Îslamê gelkî li pêşbû, ji dema hilweşandina împratoriya Medî û heya ser dema Îslamê, wêjeya Kurdî ket ber gelek êrîşen dijwar ji hêla neyarêن gelê kurd ve, ev êrîş di dema Îsalmê de jî bi xurtî berdewam bûn.

Di vê nivîsa xwe de ezê hewil bidin, çend mînakan ji wêjeya Kurdî berî Îslamê li ber destêن we rayêxim ger kîmasî jî hebin li min biburînin.

**Mînaka Yekemîn:** Pirtûka pîroz ya Zerdeşte Medî û bi taybetî besê ''Gata'' jê.

Ku ev bes bi şêweyê helbestê hatiya nivîsandin.

Weke ku tê zanîn du heb Avesta hebûn, yek li textê Cimşîd bû û ya din jî ketiya destê Yonaniyan, piştî Yonaniyan di hemî warê jiyanê de sûd jê wergirtin, ew jî winda kirin.



Xebat Shakir\\  
Oldenborg -  
Elmaniya

Em bi hevre diçûn çiyayê Kohistan  
Were da kû em xwerêniyê herin derve  
Bi hevre strana narînê bêjin.

(Ji pirtûka Elmaî Enwer Alakrad fî behdînan Bexda 1956)

**Mînaka Çaremîn,  
Qewil û duhayên Êzîdiyan:**

Bê goman duha û qewilên Êzîdiyan tev berî İslâmê hatine  
nivîsandin Û piraniya wan bi şêweyê helbestê hatine nivîsan  
din.

**1-Qewlê Îmanê:**

Ne erd hebû ne ezman e  
Ne çiya hebû ne sikan e  
Ne behir hebû ne biyan e  
Ne mîr Birahîmê Adema û ne xurasane.

**2-Duha şeveqê:**

Ya Xwedê mîr û melek ji te didin medehê  
Ewin xasê nava Qubehê  
Ewin ronahiya serê sibehê.

**3-Qewlê Sermergê:**

Rojekê ji rojane  
Werin xelkê êrifî zane  
Ji mirinê bidin beyane

Rojekê ez nebûm  
Sireke xewlebûm  
Li ber mediha xaliqê xwe bûm.

Ev çend mînakên li jor,  
xurtiya helbesta kurdî berî İslalmê nîşan dide

wê, helbestvanê Kurd êşa gelê xwe bi şêweyê helbestê  
aniye ziman,

**Helbest:**

Hormzgan rimanatîran kujan  
Wêşan şardewe gewreyî gewrekan  
Zarokar erek kirdine xapûr  
Ginaw palayî heta Şarezûr  
Şîn û kenîkan we dîl besîna  
mîrd azar tilî we rûyhiwêna  
rewîş zertuştire manewe.

**Wate:**

Bajarê Hormizganê dagir kirin  
Agirdank temirandin  
Mezin û girgirekan xwe veşartin  
Biyanîyan bi zor û sitemê  
gund û bajar heta Şarezurê talan û xera kirin  
jin û keç dîl birin  
mîrên çeleng di nav xwînê de hiştin  
rêz û rîçikên ayîna Zerdeş bê bandor mane  
dilê Ahûra Mazda bi kesî neşewtî û  
gunehê wî bi kesî nehat.

**Mînaka sêyemîn:** Helbesta ku li ser kevirekî hatiya dîtin ya  
helbestvanê Kurd ``Boraboz ``e.

Di salên 330 î b.z de,

**Helbest:**

Xwezdî ez te bi hevre bîn  
Werdî bihîrîn kutrabîn  
Bi hevre hîrîn xurînî  
Bangik dîn bi hîvre navînî.

**Wate:**

Xweziya hingî wexta ez û tu bi hevrebûn

# Qewlê pişt perda

*Ev qewil ji kasêtekê hatiye girtin bi dengê (Dayî Xema şêx Zeydîn a şemsanî, Kovan Xankî nivîsiye wergerandiye pîtên latînî)*

Kasekê vexwe ji meya zelale  
Bi dile şirîne bi zare tale  
Çawîşê dîwana siltan êzid mîr û mîlyaketa, şêx mend paşa  
Esl û dine melik şerfeddîn ev dînyaye ye betale  
Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.

Li me hilatibû sitêra sipîye  
Şemsê bi nûr û keramete  
Şefeqê da bû çarde tebeqên 'erd û 'ezmana  
Bend û tîrêja da bû lalişa nûranî heta banê kursîye  
Emê dest û damanê melik şêx sine adiya tewaf bikin  
Bila rûnîte ser berê se'detê  
Veket derê reş belekê  
Li ser heftî û dû babên qedîm bixunit û xeber bidê  
Ka bêjê bi xêra navê şîxadî  
Heke hûn pirsiyara kaniya spî dikene ka hêvînê wê ji çiye?  
Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.

Li me hilatibû sitêra zere

## Mûsîka Kurdî berî İslâmê:

Ger meriv awirekê bavêje kilasîkên kurdî û bi taybetî jî kilasîkê çiyayê Şingalê û lavijên ku li ber Lalişê têr gotin di dema serdana Lilşê de, xurtiya wêne, hevok û ziman di wan de zelale.

Di dema Xesrew Perwêz de 590-627z hunermendê Kurd yê navdar`Baberd``Tembûrvan û deng xweşekî Kurd bû ew bû yê meqamê Kurdî pêkanî ( Pirtûka serencam ).

Ger meriv van mînakên li jor weke bingeh ber bi çav bigre, xurtiye wêjeya Kurdî berî İslâmê, bi zelalî xweya dike.

Bêgoman bi sedema talankirina wêjeya kurdî, bi hezaran nivîs û pirtûkên kurdî di serdema êrîşen İslâmê û berî İslâmê de yên ku anîne ser Kurdistanê, hatine şewtandin û windakirin.

Di dawiyê de, ez bi hêvîme ku lêkolînvanenê Kurd helbest, mûzîk û çîrokên Kurdî yên berî İslâmê bikin cihê lêkolînan.

Xwendevanê hêja,  
min li gor zanîna xwe hewil da çend mînakani ji wêjeya Kurdî berî İslâmê li ber destê we rayêxim, bêgoman mînak pirin, lê ezê lêkolîna wan ji lêkolînvanan re bihêlim.

## Çavkanî :

- Dîroka Wêjeya Kurdî Feqî Huseyîn Sagînc.

Li me hilatibû sitêra cebare  
 Şemsê bi nûr û keramete  
 Şefeqê da bû çarde tebeqên 'erd û 'ezmana  
 Bend û tîrêja da bû lalişa nûranî heta bi qubikên nobedara  
 Emê dest û damanê melik şêx sine adiya tewaf bikin  
 Bila rûnîte ser berê se'detê  
 Veket derê reş belekê  
 Li ser heftî û dû babêñ qedîm bixunit û xeber bidê  
 bêjît bi xêra navê şîxadî  
 Heke hûn pîrsiyara quba felekê diken  
 Serê quba felekê nûr sitare  
 Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.


Hawara min xwedê ye û dilê damayî  
 'ewrek ji binyanê rabû,  
 Raserî lalişa nûranî girtibû şewq û nûr û alayî  
 Bila şêxekî ji malêñ adiya,  
 Pîrekî miskînî heqîqetê,  
 'ilmayekî zêdeyî 'ilma  
 Bête celsa kaniyê, runte ser berê se'detê  
 Veket derê reş belekê  
 Li ser heftî û dû babêñ qedîm bixunit û xeber bidê  
 Bêjît ka ew kî mîre bû, giyanê min gorî  
 Behra sîhanê bi keşkulka pîvaye  
 Xiveta terab zêr li ser behrê kur vedaye  
 Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.

Hawara min xwedê ye û dilê melûle  
 'ewrek ji binyanê rabû,  
 Raserî lalişa nûranî girtibû şewq û ala û nûr  
 Bila şêxekî ji malêñ adiya,  
 Pîrekî miskînî heqîqetê,  
 'ilmayekî zêdeyî 'ilma

Şemsê bi nûr û keramete  
 Şefeqê da bû çarde tebeqên 'erd û 'ezmana  
 Bend û tîrêja da bû lalişa nûranî heta banê menbere  
 bêjîn bi xêra şîxadî  
 Heke hûn pîrsiyara kaniya spî diken  
 hêvînê wê ji her û here  
 Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.

Li me hilatibû sitêra beyanê  
 Şemsê bi nûr û keramete  
 Şefeqê da bû çarde tebeqên 'erd û 'ezmana  
 Bend û tîrêja da bû lalişa nûranî heta bi cels û rewaqê  
 dîwanê  
 Emê dest û damanê melik şêx sine adiya tewaf bikin  
 Bila rûnîte ser berê se'detê  
 Veket derê reş belekê  
 Li ser heftî û dû babêñ qedîm bixunit û xeber bidê  
 bêjî giyanê min gorî  
 ka ew kî mîr bû  
 sekînye ser berê sîkanê û di dest de qelema îmanê  
 Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.

Li me hilatibû sitêra badîna  
 Şemsê bi nûr û keramete  
 Şefeqê da bû çarde tebeqên 'erd û 'ezmana  
 Bend û tîrêja da bû lalişa nûranî heta bi meke û medina  
 Emê dest û damanê melik şêx sine adiya tewaf bikin  
 Bila rûnîte ser berê se'detê  
 Veket derê reş belekê  
 Li ser heftî û dû babêñ qedîm bixunit û xeber bidê  
 Ka bêjît bi xêra navê şîxadî  
 Heke hûn pîrsiyara quba felekê diken  
 Bêjîn ka quba felekê çend zincin?, çend kursîne?  
 Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.



ev şikle ji internêtê hatiye girtin ku peristgeha Laliş kevin xwiya dikit.

Bête celsa derê kaniyê, runte ser berê se'detê  
Veket derê reş belekê  
Li ser heftî û dû babên qedîm bixunit û xeber bidê  
Bêjît giyanê min gorî  
Ka ew kî mère bû  
Behra sîhanê pîvaye bi keşkulke  
Xiveta terab zêr vedaye li ser behrêt kur  
Ew axayê min sultan êzîde  
Mehdî şerfeddinê minî gulî nûre min qebûle  
Wê dibin xivetê da digêrin şaz û me'nî, exler û tenbûre  
Hey dê mala min, mala min, mala min..tu mala min.

Hey dîno cindîno  
Şêx şîxadî 'ezîz melik fexredîne  
Quds û xelîl, mekeh û medîne  
Me çi mal nîne, malbaba me laliş nûrîne  
Hûn gişt bêjin amîne

# Mehfel

Govareke rewşenbîrî werzaneye

jimare

(1)

Havîna  
2010

*Mehfel ye destur daye  
ji bal sendika  
rojnamenivêşên  
kurdistanê ve, li pê  
biryara jimare (272)  
li roja (10\6\2010).*

Xudanê imtiyazê  
**Rêsan Hesen Cindî**  
resandinay@yahoo.com  
07504501609

Sernivêskar  
**kovan rêsan Xankî**  
Xanki\_kovan@yahoo.com  
07504969810

Sikirtêre nivêsinê  
**Hecî Mexso Heso**  
Hijy\_mag2010@yahoo.com  
07504576304

Derhênanâ Honerî  
**Xankî**

g.mehfel@yahoo.com

çapxana Hawar - Dihok

*Şikfê rexa erebî Qubêñ p. Lalîşin. Yê rexa latînî dergehê yekê yê çone  
Lalîş û Mehfela Şîxad ye. Herdû şikfî ji bal xankî ve hatine girtin.*

*Babetêñ di gorarê de derbirînê ji boçona nivêskaran dikan*

www.arsivakurdji.org